

DI Şİ'RA KLASİK DA METAFORA KİTABÊ û RENGVEDANÊN WÊ DI DÎWANA MELAYÊ CİZİRÎ DA

BOOK METAPHOR IN CLASSICAL POETRY AND ITS REFLECTIONS IN *MELAYÊ CİZİRÎ'S DÎWAN*

KLASİK ŞİİRDE KİTAP METAFORU VE *MELAYÊ CİZİRÎ DÎWAN*'NDAKİ YANSIMALARI
Ayhan TEK*

Kurte

Kitab, di şî'ra Klasîk da metafor û mezmûneke girîng e ku wê ji gelek alîyan ve kontekstên şa'irane ava kirine. Çanda qedîm ya kitabsazîya Çîn, Mîsr û Yewnanan, di Edebîyata Klasîk da jî cihê xwe girtiye û rengvedanên wê bi aşkerayî dihêne dîtin. Çanda şî'ra Klasîk li ser metnên kanonîk ava bûye, loma jî ew li ser bingeha metnan anko li ser çandeke nivîskî geş bûye. Ji ber wê jî jî *Qur'anê* û kitabên wek *Erjenga Manî* heta berhemên kanonîk yê edebî, dinî û 'ilmî di vê şî'rê da di nav gelek kontekstên cuda da û herwisa kitab û nivîs û babetên li dor evane, hatine vegotin. Bi taybetî jî ber ku bingeha evê edebîyatê li ser vegêraneke tesewwûfî ava bûye, kitêba pîroz ya Islamîyê *Qur'an*, berhemên tesewwûfî yê wekî *Mesnewîya Mewlana*, *Dîwana Hafîz* û berhemên li ser rêzimana 'Erebî û kitabên li ser felsefe û tîbbê di vê çandê da bi girîngî hatine behskirin. Di vê çarçoveyê da nûnerekî Edebîyata Klasîk ya Kurdî jî Melayê Cizîrî ye û di *Dîwana* wî da jî derbareyê mijara kitab û çanda kitabê gelek numûneyên serincrakêş hene ku mijara vê gotarê de li ser analîz û vegêrana wan bît. Metafora kitabê û rengvedanên wê yê di cîhana ku Melayê Cizîrî da ne tinê ji bo edebîyata Kurdî girîng in, belkî di çarçoveyê berfirehtir da nîşaneyê nerîteke estetîk û şa'irane diket ku têgeheştina wan de peywendîyên girîng ligel xwe binît.

Kelîmeyên Sereke: Kitab, Çanda Kitabê, Şî'ra Klasîk, Melayê Cizîrî, Edebîyata Kurdî.

Abstract

One of the significant themes in classical literature is the concept of the book, which has inspired a rich poetic context throughout history. This extensive cultural tradition reaches back to ancient civilizations, including those in China, Egypt, and Greece, where the first examples of book and paper production emerged. Such a culture has deeply influenced classical literature. Moreover, the fact that this literary culture is grounded in written texts—often compiled into books known as diwans—adds to its importance. Classical poetry frequently reflects on themes from Islamic culture and Sufism, with the *Quran* holding a particularly sacred place within this tradition. Additionally, works such as Manî's book *Erjeng* (*Arzang*), alongside Mevlana's *Mathnawî* and Hafîz's *Diwan*, are significant contributions to Sufism and literature, encompassing a wide range of subjects from medicine to philosophy and drawing from Arabic texts and other canonical sources. In this context, *Melayê Cizîrî's Dîwan*, one of the most important written works of Kurdish literature, also emerges as a remarkable example of this cultural heritage. This study will introduce the concept of book culture and examine its reflections in *Melayê Cizîrî's Dîwan*. The metaphor of the book in Melayê Cizîrî's work holds significance not only for Kurdish literature but also for illustrating how an aesthetic and poetic tradition perceives the book within a broader cultural context.

Keywords: Book, Book Culture, Classical Poetry, Melayê Cizîrî, Kurdish Literature.

Öz

Klasik edebiyat metinlerinde önemli mazmunlardan biri de kitap olup bu mazmun etrafında zengin bir şiirsel bağlam oluşmuştur. Kitap ve kağıt üretiminin ilk örneklerinin dayandığı Çin, Mısır ve Yunan tarihine uzanan bu geniş kültür, Klasik edebiyatta da derin yansımalar yaratmıştır. Diğer taraftan bu edebiyatın dayandığı kültürün bir yönüyle yazılı kültür olması ve üretilen metinlerin divan

ve benzeri adlarla kitaplaştırılıyor olması başlı başına önemli bir olgudur. Bu nedenle Klasik şiirin temellerini dayandırdığı İslam kültürü ve tasavvuf başta olmak üzere birçok göndermeden dolayı, *Kur'an* bu şiirde bir kutsal metin olarak önemli bir yer tutar. Diğer taraftan Manî'nin *Erjeng* isimli kitabı ile tasavvuf ve edebiyat açısından önemli görülen *Mevlana Mesnevisi* ve *Hafız Divanı* gibi eserlerle tıptan felsefeye, Arap dili kaynaklarından diğer kanonik metinlere kadar geniş bir kültür yelpazesi bu şiirde sunulmaktadır. Bu çerçevede Kürt edebiyatının en önemli yazılı metinlerinden biri olan *Melayê Cizîrî Dîwan*'ı da bu kültürün dikkat çekici bir metni olarak karşımıza çıkmaktadır. Bu çalışmada söz konusu kitap kültürü tanıtılırken bunun *Melayê Cizîrî Dîwan*'ındaki yansımaları ele alınıp incelenecektir. Kitap metaforunun Melayê Cizîrî'nin temsil ettiği anlam dünyasındaki yansımaları sadece Kürt edebiyatı açısından değil daha geniş bir çerçevede estetik ve şiirsel bir geleneğin kitabı alımlama biçimini de göstermesi bakımından önem arz etmektedir.

Anahtar Kelime: Kitap, Kitap Kültürü, Klasik Şiir, Melayê Cizîrî, Kürt Edebiyatı.

“Kitab mirîyan didete axiftin û gotinên zindîyan digehînte te”

Cahiz

DESTPÊK

Reng e ku tarîxa insanîyetê bi keşfa nivîs û teknîkên li dor nivîsê destpê kiribît. Lewra tarîxa berîya nivîsê, tarîxeke tarî û nedîyar e. Ji ber wê jî peydabûna nivîsê digel xwe qeydkirina hafizeya mirovahîyê û sazkirina têkilîyên di navbera duh û îro da pêk îname. Wêca ji ber gelek sebebên hosa, nivîs ji bo insanîyetê girîng hatîye dîtin. Insanan bi rêya nivîsê hem hest û fikrên xwe vegotine û ew pêşda birine hem jî nivîs bi xwe bûye amûr û rêya gelek huner û qadên estetîkê. Ji ber hindê jî nivîs û tiştên bi nivîskî hatine hilberandin, di çarçoveyê gelek berfireh da dihêne nirxandin. Di nav wan deq, berhem û nesneyan da jî zêde pûte bi kitabê hatîye dan, herweku Labarre vedibêjî “[K]itab berîya her tiştî metn e, metn jî sebebê hebûnî yê kitêbê ye. Kitab, di serdemên dûvdirêj da yekane amûrên belavbûn û parastina agahîyan bûn. Ji ber vê yekê kitaban gelek tişt bi berfirehî li tarîxa çand û şaristanîyê zêde kirine (Labarre, 1994, r. 5).” Bi vî şiklî mirov di navbera nivîs/kitab û şaristanîyê û gelek xalên di da têkilîyên cuda saz biket. Lê di çarçoveya teng ya vê nivîsê da mijar dê li ser “kitab”ê bît ku ew hem wek nesneyekê hem jî wek metaforekê dê bihête vegotin û vekolan.

Tiştên bi nivîskî heta raddeyekê wek “kitab” dihêne nasîn û gava em bikevine pey rîşeyên wê yên etîmolojîk, dihête dîtin ku “kitab” kelîmeyeke ‘Erebî ye ku mestera wê ji koka “ketb”ê [“ke-te-be”yê] hatîye perandin ku wateya wê jî “agahîyên bi rêya nivîskî berhevbûyî” ye. Piştî Islamîyetê di zimanê ‘Erebî da ew wate firehtir bûye û bo gelek wateyên di hatîye bikarînan. Bo numûne di çanda ‘Ereban da wateya kitabê berfirehtir bûye û îdî ew dihête me‘naya “Qur’an”, “wehy”, “mektub”, “belge”, “agahîyên di navbera du bergan da” û “her yek beşên sereke yên berhemekê” (Bozkurt, 2002, r. 120).

Çawa ku di vê serdema modern da veguherîneke ji formên kitabên qedîm ber bi kitabên bi deng û dijîtal (EPUB, PDF û formatên din...) çêbûye, ji serdemên ewil heta çend sedsalên dawî jî gelek guherîn û pêşketin çêbûne. Ji bo ku kitab, wek têgeh û nesneyeke tarîxî û çandî baş bihête zanîn, ew serencam girîng e. Di vê çarçoveyê da di navbera nêrînên insanên berê û yê nehe da derheq îmaj yan jî pênaseya kitabê da ferq hene. Lewra ji bo insanên ku berîya peydabûna çapxaneyê jîyabûn, kitab tişteke di bû û ji bo yên paş wê serdemê jîyane, kitab temsîla tiştên cudatir diket. Herwisa ji bo komele û cimaetên dînî û xeyrî-dînî jî kitab, reng e aidê texeyyûlên cuda bit. Ne tinê ji aliyê naverokê ve, ji aliyê teknîkî ve jî di navbera kitabên îro û yên serdemên

ewil da ferq hene. Bi peywestîya guherîn û pêşketina “nivîs”ê û pêşveçûnên teknîkî; xasîyet, qîmet û çawanîyên kitabê jî guherîne.

Di her çand yan jî qadê da girîngîya kitabê kêr zêde biguherit jî bi taybetî di nav şî'ra Klasîk da wek îmajêke xurt û di dîdgeha ‘irfanî da jî bi teşbîha rûyê yarê û pîrozahîyan ve kitab temsîla nêrîneke nû diket. Di vê çarçoveyê da kitab jî serdemên ewil yê ku bi nivîsê destpê kirine heta serdema navîn û pê da—ya ku şî'ra Klasîk di wê serdemê da pêşketîye—ji gelek qonaxan derbas bûye. Berîya ku em li ser mezmûna kitabê û rengvedanên wê di şî'ra Klasîk û bi taybet jî di *Dîwana Melayê Cizîrî* da bibînin û vebêjin, divêtin em pêşîyê bi kurtî serpêhatîya kitabê vebêjin da ku ew mezmûn çêtir bihête famkirin.

1. Kurtedîroka Kitabê

Ji serdemên antîk hêreve, li ser gelek tiştên wek belg û qalikên daran, kevilên heywanan, tabletên ji axa gilî û li ser ber û hêstikan nivîs hatine nivîsîn. Digel wê piştî ku papîrûs, parşomen û kaxez peyda bûne, ji “nesneyên nivîskî” ber bi forma “kitêb”a îro ya modern, pêşketin çêbûne. Ji ber ku kaxeza papîrûsê ji gîyayê papîrusê dihate hilberandin, ew weku alaveke girîng ya nivîsê ewil li Misrê hatîye bikarînan. Lê wextê li Misrê papîrûs dihate bikarînan, jixwe li Çînê sin‘etê kitabê pêşketibû. Herweku Labarre neql diket “[li] welatê Çînê insanan berîya du hizar salan dizanîn ka kitab çî ye. Lewra li ser kerên hêstik û kevilên heywanan, bi wateya kitaba îro, metn hebûn ku eve li ciheke di nehatine dîtin. Lê paşê li şûna evane, şerîtên/ruloyên hevrêşimî dihêne dîtin û paşê jî li şûna hevrêşimî kaxez hatîye bikarînan (Labarre, 1994, r. 39).” Herwisa divêt bibêjin ku di wan serdemên antîk da kitab, exleb bi şiklê ruloyan dihatine nivîsîn. Paşê ji ruloyan derbasê awayê kodeksê bûye û ev pêvajoya wesa dewam kirîye heta ku çapxane peyda û berbelav bûne. Kitab bi vî şiklî veguherîye û teqrîben di sedsala 16an da ketîye qalibê îro. Helbet heta çapxane di sala 1450an da li Ewropayê peyda û belavbû, kitab weku nusxeyên destxetan dihatine nivîsîn û zêdekirin. Yanî insanan berhem yek bi yek bi destan dinivîsîn û wesa kopya dikirin. Hetta berîya çapxaneyê, zêdetir di nav Yewnan û Romayê da kolayên perwerdebûyî hebûn ku ewane kitab kopya dikirin ku ew endustrî jî exleb bi destê kilîseyan ve pêk dihat. Di nav manastiran da jî cihên bi navê “scriptorium” hebûn ku li wan deran karê zêdekirina kitaban dihate kirin (Dalkıran, 2013, r. 202-208). Elbet di nav çanda Islamê da jî heta sedsalên dawî jî ew çanda destxetan berdewam bû ku gelek koleksîyonên kitêbxaneyên navdar yê resmî yan jî yê şexsî ji wan berhemên destxetî pêk dihatin. Loma ew çanda destxetî li Rojava zû temam bibît jî li Rojhilatê berdewam bûye.

Gava em berê xwe bidene teknîk û taybetîyên fîzîkî yê kitaban, li serdemên pêşîn, hingî kitab ji bergên parşomenan pêk dihatin ku di wan da wekî berhemên destxetî, serenav nedihate

nivîsîn. Lewra di van berheman da sal û cihê nivîsîna berhemê exleb diyar nebûn. Lê piştî demekê li dûmahîka wan kitabên bi çend rêzikan navê berhem, nivîskar, navê çapker û tarîx û cihê berhem lê hatîye duristkirin û agahîyên bi vî şiklî dihatine nivîsîn. Ji bo van kome-agahîyan jî weku têgeh kelîmeya Yewnanî “colophon” dihat bikarînan (Labarre, 1994, r. 54-58). Herwisa ew colophon di berhemên çanda Islamî da jî dihat dîtin ku ji bo wê “temmet” hatîye gotin.

Li gor teknîkên îro her kitabek li gor rûpelên wê, ji formayan pêk dihat û wesa çap dibît. Heman teknîk serdemên berîya çapxaneyê jî hebûye û berîya ku berhem bigehine formata îro ya kitabê, bi formayan anko bi fasikûlan pêk dihatin û wesa belav dibûn. Li serdemên ku çapxane nebû, kaxez yek bi yek bi destan dihatine duristkirin. Anko her rûpelek bi destan dihat nivîsîn û kitab jî bi destan dihatine cildkirin. Ji bo ku kitabek bihête zêdekirin berîya her tiştî divîya talibên wê kitabê li nav network û derdoreke wesa xwûner û hindek jî dewlemend da ban. Lewra di wan serdeman da kitabên bi qîmet di nav komeleyeke teng da bûn. Çunku “kitab ji alîyekê ve bo eşraf û aristokratan nîşaneyê dewlemendîyê û ji bo lêkolîner û xwûneran jî çavkanîyên sereke bûn (Dalkıran, 2013, r. 211).” Yanî kitab di nav derdorên wesa bijarte da nesneyên ne ji rêzê bûn, ber eksê wê, ew bi qîmet bûn. Herwisa hindî bi destxistina wan, kopyakirina wan jî mesele bû. Lewra bi taybet kitabên dînî û edebî ger nusxeyên bijarte ban, xwudanê wan yên musteqbel anko xwazgîn û bikirên wan berheman, divîya ew berhem bi layiqê nusxeya xwe dabana kopyakirin. Ji bo hindê jî xettat û katibên pîspor yên hunerdest lazim bûn. Çunku ew berhemene jixwe şahkar bûn û digel wê giranbiha, gencîne û serwetên maddî û me‘newî bûn (Tökel, 2023, r. 49).

Li Rojava, nêzîkê wan salên ku çapxane peyda bibît, endustrîya tîpografîyê jî geş bû. Tîpografi yanî hunera xettê nivîsê yan jî xettatî, di tarîxa kitabê da xwedan roleke girîng e ku li Rojava di wan serdeman da çar curreyên tîpên xettî yên Gotîk hebûn ku ew li gor xwûnerên metnan diguherîn: xettê adetî “*lettre de somme*”, exleb xettê aidê metnên dêran “*lettre de missel*”, di kitêbên Latînî yên vegêranî da xettê îtalîk yê “*gotica bastarda*” û li Rojavayê Ewropayê jî bi herfên Romen xettê “*littera antiqua*” zêde hatîye dîtin (Febvre & Martin, 2000, r. 55).

Endustrîya kitab û çapxaneyê ji alîyekê ve tîpografi, şekl û qalibê kitabên pêşve birîye û ji alîyekê ve jî ji bo ku naveroka wan berheman dewlemendtir biken ji hunerên cuda istifade kirine. Ji ber hindê di nav metnên kitabên da bicîhkirina mînyatûr û resman hem li Rojava hem jî li Rojhilatê çandeke qedîm e. Çawa ku di berhemên klasîk yên Rojhilatê û bi taybetî jî yên di piştî Islamê da dihat dîtin, mînyatur û hunerên wekî tezhîbê peyda bûne li Rojava jî bi heman awayî mînyatûr û tezhîb û tezyîna kitabên dihat dîtin. Li Rojhilatê zêdetir kitabên dînî yên

wekî nusxeyên *Qur'anê* bi taybet dihatine duristkirin, berhemên edebî û kanonîk yê wekî *Şehnameya Firdewsî* jî bi neqş û nîgaran ve dihatine xemilandin. Li gor Febvre û Martin neql diken, li Rojava jî zêdetir kitabên dînî û yê duayan, romanên şovalyeyan, berhemên li ser çîrokên nêçîrvanîyê û berhemên destxetî bi mînyaturan ve hatine neqşkirin. Ev berheme jî zêdetir ji bo kesên dewlemend û burjuva û bo giregirê dêrê û bo senatoran dihatine duristkirin ku ew kar jî bi bihayên zêde dihatine kirin (Febvre & Martin, 2000, r. 65).

Mirov dişet horeng bibêjît ku di bawerîya Bisirmanan da çekirina sûretê insanan wek guneh û qedexe hatîye dîtin, di nav wan da xweşnivîs—husnê xett—pêşketîye. Lêre fonksiyona nivîsê ne tinê kopyakirina metnekê bû, digel wê xemilandina berhemê jî hebû. Bi vî şiklî hunera Islamî ya li dor xweşnivîsê geş bûye ku yek ji mînak wê jî xettê Kufî ye ku ev xette gelek dihat ecibandin. Kesên ku ev kare dikirin—xettat—herwisa tezhîbkar bûn ku tesîra wan jî li ser hunera mînyaturê aşkera ye.

Xaleke di ya kitabê jî ew e ku bi rêya wê, fikr û nêrînên nû hem belav dibin hem jî dihêne tomarkirin. Ji ber wê jî taybetîyên kitabê yê li ser civakê jî derdikevine der. Jixwe ji ber van taybetîyan e ku kitab bûye sebebê bizavên civakî, pêşkevtinên 'eqlî û fikrî. Ji kilîseyên Mesîhîyan heta cimaet û terîqetên dînî yê civakên dîtir, insan li dor kitaban berhev bûne û herwisa kitab bûne nesneyên pîroz û sebebên motîvasyonên dînî, sîyasî û edebî.¹ Herwekî me li jorê îşaret pê daye, kitab bûye nesneyeke hunerê jî û li dor wê hem sektor û endustrîyên cuda çêbûne hem jî qadên hunerên wek tezhîb, minyaturî, mucellidî, xett û husnê xett pêş ketine. Yanî estetîkek li dor kitabê çêbûye û ew heta îro hatîye. Dîsa çanda kitêbxaneyan, nivîskarî, edîtorî, wergêrvanî, weşangerî û teknîk û qadên li dor çapkirin û belavkirina kitêban jî mînakê dî ne. Eve hemû li alîyekê, ger em dîsa bihêne ser xala ewil, dewletserê kitaban xwandevanî pêşketîyê ku bi rêya wê jî belavbûna fikran çêbûye. Li ser tesîra wê yekê Labarre muqayeseya du navdarên Mesîhî diket ku ji wan yek bi hêza kitabê û çapxaneyê şîyaye tesîreke mezintir pêk bînît. Ev muqayese hosa ye ku zanayê ayînî yê Mesîhî, Jan Hus (1370?-1415) di sala 1415ê da ji ber pîrsgirêkên nav dêrê wê serdemê, bi saxesax dihête sotin. Herçend fikrên wî digel wî nehatibine tunekirin jî, ew fikr ji memleketê wî Bohemyayê veder nebûne. Lê sedsalek paşê, qeşeyê navdar Martîn Luther (1483-1546) li Wittenbergê fikrên xwe li ser lehweyan dinivîsît û wan digel wergêrên wan yê bi çend zimanan belav diket. Bi vê yekê ew di nava çend mehan

¹ Têkiliya kitab, iqtidar û kanonê meseleyeke berfireh e ku mijara xebateke di ye. Lê bêtî ku em bikevine nav wê babetê, divê em bînine bîra xwe ku kitab karîger e li ser meseleyên civakî. Lewra bi taybet li "Rojhilata Naverast" şer û mîlmilanên civakî, dînî û mîtik li ser bingehên kanonîk yê "kitabî" dihêne icrakirin. Anko tesîra *Qur'anê* ya li ser metnên dîtir û herwisa tesîra *Tewratê* [Israîliyâtê] ya li ser zihn, nêrîn û texeyyula insanên vê cografyayê ber bi çav e. Loma jî kitab ji gelek alîyan ve ji nesneyekê zêdetir e û ew aktoreke karîger e.

da li temamê Almanyayê dihête nasîn ku gava ew mirîye kitabên wî nêzikê çar hizar caran hatine belavkirin. Bi vî şiklî tiştê ku Jan Husî neşîyaye pêk biînît, bi xêra serê kitabên, Martîn Lutherî pêk înye. Lewra di destê wî da amûrek hebû: çapxane (Labarre, 1994, r. 66). Bi vî şiklî dihête dîtin ku ka hêza çapxane û metnên ku ji alîyê wê dihêne çapkirin, yanî deq û kitabên çî hêz li gel xwe înye.

2. Di Şi'ra Klasîk da Metafora Kitabê

Berhemên Edebîyata Klasîk li ser çandeke pîralî û kanoneke dariştî hatiye vegotin û vehênan. Digel wê, ev edebîyate ji alîyê vegotin û şeweya gotinê ve ji metafor, temsîl, hunerên edebî, hêmayên di yê vegêran û estetîkê ve pêşketîye û geheştîye qonaxeke wesa ku wê qalib û qaîdeyên xwe girtine. Herwisa şî'ra vê edebîyatê, ji çandên cuda istifade kirîye û di bin sîvana zimanên 'Erebî û Farisî da geş bûye. Loma ji metnên bi van zimanan hatine nivîsîn gelek caran metnên edebî nebin jî di vê edebîyatê da bi şiklekê cihê xwe girtine. Bi taybetî di Farsî da metnên edebî û di 'Erebî da jî metnên dînî û 'ilmî di nav şî'ra Klasîk da digel tenasub û têkilîyên mezmûnî hatine vegotin. Navên wan kitabên ku zêde dihêne vegotin exleb di vê çanda hevpar da ji şa'irên cuda yê zimanên cuda da bi heman kontekstê hatine gotin.

Şa'irên Edebîyata Klasîk bi rêya jêgirtinan yanî iqtibasê hin caran ji metnên di kelîme, rêz yan jî beyt û cumle wergirtine. Hetta li ser wê yekê bi rêya nezîreyê awayên wek texmîsê peyda bûne ku şa'iran rasterast riste û beytên şa'irên di wergirtine. Bi wê yekê jî ew metnên di nav wan kitabên da bûn, berabelavtir bûne û digel wê jî kitab û dîwan û mesnewî neqlê serdêmen di bûne. Bi vî şiklî çanda kitabê di nav xwe da jî belav bûye. Wêca berîya ku em mînakê di şî'ra Klasîk da yê ku berbelav in biden, em bera xwe bidenê ka şa'irên di û herwisa Melayê Cizîrî, zêdetir navê kîşk berhem û metnan di nav têkilîyên mezmûnî da wek "klîşe"yekê vegotine. Anko di eslê xwe da ew navên kitabên dibî ku ji bo îşaret û referansa gelek xalan ve hatibine neqilîkirin, lê exleb armanca eslî bi borandîna wan nava ew e ku ew tinê amûr in ji bo vegêrana şî'ra şa'irî. Ji ber hindê jî hem qesta şa'irî hem jî sebebê borandîna navê kitabê, li gor konteksta şî'rê diguherî û wesa me'naya xwe digirî. Lê herçawa bî, rêjeyek û kanonek heyê ku navê hin kitabên "mecbûren" (zêde)derbas dibî ku em dê nehe jî berê xwe bidene wan.

2.1. *Qur'an*

Şî'ra Klasîk ji gelek çand û bawerîyên cuda istifade kirîye û digel wê ew zêdetir li dor mijarên tesewwûfê hatiye honandin. Ji ber wê jî *Qur'an* bûye berhemeke sereke ya vê şî'rê ku tesîreke xurt ya *Qur'anê* li ser vê çandê çêbûye. Bo numûne di vê şî'rê da yek ji şa'irên navdar—ku dîwana wî jî metneke kanonîk e—Hafîzê Şîrazî (mr. 1390) ye ku navê wî esasen "Xace Şemseddîn Muhemmed" bî jî ew wek Hafîzê Şîrazî bi navûbang e. Lewra mexlesa wî "Hafîz"

e ku ew kelîme jî îşareta wê ye ku ew hafîzê *Qur'anê* bûye (Yazıcı, 1997, r. 104). Ji alîyê dî ve şa'irê Kurd yê navdar Melayê Cizîrî jî ku mijara vê gotarê ye, mexlesa “Mela” bikartînît. Melayê Cizîrî xwe wekî “muftîyê zeman” û “muftîyê ‘îşqê” jî pênase diket ku ew yek jî rasterast bi *Qur'anê* û çanda wê ve girêdayîye. Hetta ew di vê beytê da bi xwe “kitab”ê ji bo *Qur'anê* bikartînît û wê wekî penaeke qahîm dibînît û îşaretê didetê: “Aşîqê mes'elxwahi were em muftîyê ‘îşq in/ Destek Sunnet e têda û yekî nessê **Kitab** e (Melayê Cizîrî, 2012, r. 158).”

Qur'an bi xwe dibêjîte xwe “kitab.”² Loma kelîmeya “Kitab”ê û kelîmeya Mishefê bo wateyeke pîroz hatine bikarînan. Ji alîyê dî ve di bawerîya Bisirmanan da kitabeke dî heye ku ew jî li mehşerê dê derkevîte pêşîya wan ku ka wan çî xêr û guneh kirine. Li gor wê bawerîyê her tiştên di navbera erd û esmanan da di Kitabê da qeydkirî ne. Bi vî şiklî kitab herwisa hem rastî hem jî metaforeke girîng ya Bisirmanîyê ye. Li gor Pedersen ew têkilîya di navbera “kitab” û *Qur'anê* da di çanda ‘Ereban da hebûye ku ew wê hosa şîrove diket:

‘Ereb, kelîmeya “kitabê” hem ji bo kitabekê, hem ji bo mektubeke dirêj yan kurt, bo kitab yan jî belgeyekê yan jî ji bo pereke kaxezê ya nivîskî bikartînin. Lê gava behsa kitabeke kifş yanî rasterast bi wateya “el-Kitab” bikarbînin, ew dihête wê me'nayê ku qesta wan *Qur'an* e. Kitab, di çî dînen dî da wekî ya di Islamê da hafî, roleke girîng neleyistîye. Her kelîmeya “di navbera du bergan da” gotina Xwedê ye û loma jî ew ezêlî ye. Anko ew nehatîye afirandin û ji alîyê hêza zimanî ve jî mu'cize ye. (Pedersen, 2013, r. 29)

Qur'an li gor bawerîya Bisirmanan kitaba dawî ya ilahî/pîroz e. Ew hersê kitabên berîya wê ji bo pêxemberên dî hatibûn jî dîsa pîroz û kitabên muqeddes in. Ji ber wê yekê, *Qur'an* çawa ku dibêjîte xwe “kitab”, hersê kitabên berîya xwe jî wesa te'rîf diket ku ehlê wan hersê dînen/kitabên berîya xwe jî wekî “ehlê kitab”ê bi nav diket. Bo numûne *Qur'an*, di sûreya Beqereyê di ayetên 44, 53, 63, 78-79an û di çendîn ayetên dî yên vê sûreyê da bo *Tewratê* kelîmeya “kitab”ê bikartînît. Herwisa di heman sûreyê da di ayeta 113ê da jî “kitab”ê hem ji bo *Tewratê* hem jî ji bo *Incîlê* bikartînît. Ji ber wê jî di bawerîya/çanda Islamê da kitab ji alîyekê ve jî li şûna “dîn”î dihête bikarînan. Yanî di serdema ku *Qur'an* nazil dibû, hazirîyeke wesa ya fikrî hebû ku hêj *Qur'an* tamam nebibû, anko wehyê dewam dikir û Muhemmed Pêxember hêj di heyatê da bû û *Qur'an* hêj wekî kitabekê neketibû qalibekî, lê wê digote xwe “kitab.” Bi taybet di serê sûreya Alî ‘Imranê da Xweda wehyê hosa wek kitabekê te'rîf diket: “Wî, ji te re

² Bo numûne gava mirov *Qur'anê* vediket, hêj di rûpelê ewil yê çepê anko di destpêka sûreya Beqereyê da—li hember sûreya Fatîheyê—di ayeta duyem da Xweda dibêjît “Aha eve ew Kitab e ku têda guman nîne (Beqere: 2).” Herwisa di gelek ayetên *Qur'anê* da “kitab” exleb bi du me'nayan dihête gotin. Ya yekê di konteksta te'rîfa civatên berê—ke wate yê ku ji wan ra kitab hatine hinartin: fille û cihûyan—ehlê kitab e. Me'naya dî jî gava *Qur'an* behsa xwe wek piştrastkera kitêba cihûyan *Tewratê* diket, bi kelîmeya kitabê xwe didete nasîn. Bi vî şiklî *Qur'an* wek kitab, di navbera xwe û kitabên berîya xwe da jî silsile û peywendîyekî saz diket.

Kitab hinart û herwisa *Tewrat* û *Incîl* jî hinartibû (3). Ew e yê ku bo te Kitab hinartî. Ayetên wê yên muhkem bingeha wê Kitabê ne (7).” Di vê çarçoveyê da çend me‘nayên di ji bo “kitab”ê di *Qur’anê* da hatine—bo numûne sûreya Mu‘mînûn ayeta 62yê—ku eve mijara xebatên di ye.

Ji aliyê di ve ji bo *Qur’anê* “Mushef/Mishef” jî dihête gotin û ji ber wê jî per û sahîfeyên *Qur’anê* bi xwe jî pîroz in ku ew jî wekî em dê di mînakê şî‘ran da bibînin, wek metafor jî dihêne bikarînan. Divêt wê jî bibêjin, *Qur’an* jî ber ku heta serdemên nêzîk bi destxetan ve hatiye zêdekirin—ku li gor Özkafa cara ewil ew di 1694an da li Hamburgê hatiye çapkirin (Özkafa, 2010, r. 317)—li ser destnivîs, destxet û xettatîyê çandeke dewlemend ava bûye ku tesîra wê li ser şî‘rê jî peyda bûye.

Di çarçoveya vê nivîsê da mirov dişet gelek mînakan bidet ku ka *Qur’an* weku kitabekê çawa hatiye vegotin û di nav çî mezmûnan da hatiye bikarînan. Lê ji ber ku di beşên jêri da em dê zêdetir behs biken em tinê mînakekê derheq *Qur’anê* biden ku di vê beyta Tirkî da kitab yanî *Qur’an* digel *Gulistana Se‘dîyê Şîrazî* çawa hatiye zikirkirin û îşareta wê dihête kirin wextê *Qur’an* li ser nexweşan bi taybet jî kesên di sekeratê da ne bo dihête xwandin: “Başını eğüp bu gonca *Gulistan* okur kaçan/ Ben sanuram ki hastası için *kitâb* açar (Kurnaz, 2003, r. 69).³”

2.2. *Erjeng*

Di nav çanda Rojhilatê û dewrê Manîheîst da kitêba pêxemberê dînê Manîheîzmê, ya bi navê *Erjengê*—yan jî *Ardahang*, *Eikon*, *Erzeng*, *Erteng*, *Nîgar*—jî gelek alîyan ve navdar e. Manî di vê kitabê da resmê derbareyê afirandina dinyayê û dûmahîka dinyayê bi destê xwe çêkirine. Bi taybet jî ber ku di wê kitêbê da resm—tablo, neqş û nîgarên rengîn—hebûne ew hem wekî kitêbeke pîroz hem jî şahkareka estetîkê hatiye dîtin. Herwisa ew kitab jî bo bawerîya Manîheîzmê jî girîng e ku li gor Jes Asmussen, wateya navê wê berhemê di Farsîya Kevn da “peyama heqîqetê” ye (Asmussen, 2011, r. 689-90).

Manî li Babîlê di sala 261ê da hatiye dinyayê û di dewra du padişahên Îranî da, anko di serdema Erdeşîrê I. (226-241) û serdema Şapûrê I. (241-272) da jîyaye. Li gor çavkanîyan wî di navbera

³ Li ser vê beytê divêt bibêjin ku dildar ciwan e anko xonce ye ku çawa ew hêj nebişkivîye û devê wê girtîye û li ser baxê gulan şor bûye, teşbîha vê kompozîsyona rastî, ji bo yarê dihête kirin ku devê yarê hem ji ber sorbûnê wekî gulê ye hem jî ji ber ku yar naaxivît devê wê jî biçûk û hemma vekirî ye. Ew rûniştîye ku kitêbekê (*Gulistana Se‘dî*) dixwûne. Wêca şa‘ir vê teşbîhê ji bo têkilîya xwe û yara xwe bikartînît, çawa ku xonce li ser baxê gulan ser-şor bûye yara wî jî ji ber ku ew—anko şa‘ir—nexweşê ‘eşqê ye, yar li ser wî “kitab”ê dixwûnît. Elbet lêre da qesta jî kitabê, *Qur’an* e. Lewra têkilîya wê û xwandina wê ya li ser kesê nexweş—bi taybet jî li ser kesê di sekeratê da ye—dîmenek jî jîyana rojane ye. Jixwe di vê çandê da *Qur’an* li ber serê kesên nexweş dihête xwandin. Lê ew xwandin exleb di halê matemê da û bi dengê hêdî ye ku gelek caran kesek dengê lêzimê/a nexweş yê/ya ku *Qur’anê* dixwûnît nabihîsit. Ji ber wê jî *Qur’an* xwîn hem bêdeng e herweku dev lê nîne hem jî têkilîya di navbera gul(a Muhemmedî) û *Quranê* da jî di hizra xwûneri da dihête şînkirin.

çemên Dîjle û Firatê da jîyan borandîye û babê wî yê bi navê Patik, navê kurê xwe bi me'naya "yê nehête jibîrkirin û mayînde" kirîye "Manî." Manî, Şapûrê I. gazî dînê xwe kirîye û di wî karî da jî serkeftî bûye. Manî, gava Şapûrê I. bûye desthilatdar yanî di 9ê Nîsana 243ê da kitêba xwe ya bi neqş û nîgaran ve tijî wek nîşaneyê pêxembertîya xwe pêşkêşî wî siltanî kirîye.

Derheq Manî û berhema wî *Erjengê* da gelek efsane û gotin hene. Hetta di berhemên li serdema Islamê da jî behsa wî û berhema wî dihête kirin ku ji wan yek jî berhema navdar *Beyanu'l-Edyan* (1092) e ku di wê da dihête gotin Manî di hunera xetkêşîyê da gelek serkeftî bûye û berhema wî *Erjenga Manî* jî bi resmên xweşik û giranqedr ve hatîye xemilandin. Di heman metnê da dihête vegotin ku ew kitab di nav xizîneyê Xezneyê da veşartîye. Herwisa Firdewsî jî di *Şehnameyê* da dibêjî ku Manî ji Çînê hatîye, hostayê vegotinê û di hunera nîgarkêşîyê da jî bêhemta ye (Yıldırım, 2012, r. 147-153). Digel hindê, nivîskarên serdema ewil yên Islamê jî têda çend kesên wekî Cahiz, Esedê Tûsî û Ebu'l-Me'alî jî behsa Manî û kitaba wî kirine (Alicî, 2018, r. 200).

Manî û kitaba wî *Erjeng*—ya ku negeheştîye îro—ji gelek alîyan ve girîng hatine qebûlîrin. Lê di şî'ra Klasîk da zêdetir ji ber nîgarkêşîya Manî û nîgarên wî yê di kitaba wî da û têkilîya wê çendê li gel Çînê û çanda Çînê ya resm û sûretkêşîyê ve pûtahîyeke mezin bi wê kitabê hatîye dan. Lewra *Erjeng* hem ji alîyê hilberandin û bikarînan kaxezê û karên nivîsê hem ji ji alîyê teswîr û resamtîyê ve serincrakêş û seyr e. Çunku hunera teswîrê têkilîyeke xurt ligel Çînê heye ku di şî'ra Klasîk da jî ev têkilîye li dor gelek mezmûnan ve hatîye bikarînan. Ji alîyê dî ve jî di nêrîna vê şî'rê da ressam û resm ji Çînê hatine ku bi taybet di mesnewîyên wek *Xusrew û Şîrîna Nizamîyê Gencewî* da jî dihête dîtin, ressamên ku rûyê dildaran xêz diken her tim ji Çînê ne. Herweku Schimmel jî dibêjî "Çîn navenda hunera resmê" ye (Schimmel, 2020, r. 196; r. 241). Ji ber wê jî têkilîya di navbera mezmûnên weku seher, çemen, tebîetê xweşik, resm, rûyê yarê û kitab û teswîrê hwd. da rasterast Manî û *Erjengê* dihête bîra xwûner/bîserê şî'ra Klasîk. Loma di vê şî'rê da Manî û *Erjeng* bi vî şiklî hem ji ber estetîkê û xett û xweşnivîsîyê hem ji ji ber pîrozîya wê kitêbê hatine bikarînan. Mînakên li ser wê berhemê di *Dîwana Melayê Cizîrî* da jî dihêne dîtin ku em dê wan li jêrî biden.

2.3. Berhemên dî yên kanonîk û edebî

Di çarçoveya giştî ya şî'ra Klasîk da hem di dîwanan hem jî di mesnewîyan da navê hin berhemên girîng dihêne zikîrkirin. Ev yeke, exleb ji ber girîngîya wan berheman û tesîra wan ya kanonîk e ku ew çî 'Erebî, çî Farsî, çî jî bi Tirkî bin, di temamê şî'ra Klasîk da dihêne vegotin. Herçend di nav van hersê zimanan/edebîyatan da navê hin kitabên cuda biborin jî di çarçoveya vê xebatê da em dê tinê kurte-mînakên giştî—yê aidê kanona mezin—biden, lewra

mijara vê nivîsê çarçoveya giştî ye. Wêca bo numûne Cemâl Kurnaz li ser vê mijarê hem navê hin ji wan kitaban rêz diket hem jî derheqê çend kitabê zêde meşhûr da û bo yê ku zêde hatine bikarînan van agahîyane didet:

Dîyar e ku di şî'ra Klasîk da navê hin kitaban dihête zikirkirin. Evne digel ku navê taybet bin jî herwisa ligel wateyên xwe yê luxetî û di nav hêmanê ciwankariyê da yê wekî tenasub, tewrîye, cinas û îhama tenasubî anko di nav babeteke edebî da dihêne bikarînan. Evne exleb berhemên klasîk û populer yê aidê medenîyeta hevpar ya Islamê ne. Loma bi 'Erebî, Farsî û Tirkî hatine nivîsîn. Digel berhemên edebî yê wekî *Bostan*, *Gulistan*, *Mehzenu'l-Esra*, *Metle'u'l-Enwar*, *Baharistan*, *Mehbûbu'l-Qulûb*, *Seb'a-i Mu'alleqe*, *Gulşena Raz*, *Nigaristan*, *Xusrew û Şîrîn*, *Leyla û Mecnûn*, *Suheyli û Newbahar*, *Kitaba Gul û Mul*, *Dîwana Katibî* û *Şah û Derwêş* û berhemê dînî yê wekî *Keşşaf*, *Ihya-u 'Ulumi'd-Dîn*, *Şerha Metali'*, *Durer*, *Tecrîd*, *Tewali'* dihêne dîtin. Herwisa kitêbên wekî *Qanûn* û *Şîfa* yê derbareyê tîbbê û derbareyê rêzimanê da jî metnên wekî *Emsîleyê* dihêne vegotin. (Kurnaz, 2003, r. 66)

Bostan û *Gulistan* herdu berhemên Se'dîyê Şîrazî ne—navê şa'irî yê rastî Ebu Ebdullah Muşarrîf bin Muslîhê Şîrazî ye (mr. 1292)—ku *Bostan* berhemeke exlaqî û pendî ye ku Se'dîyê Şîrazî ev berhema xwe pêşkêşî Ebubekir bin Se'd bin Zengî kirîye. Gelek wergêran û şerhê van herdu berhemên bo zimanên dî hatine kirin û di medreseyan da jî hatine xwandin. Lê *Gulistan* ji *Bostanê* navdartir bûye û di gelek kitêbxaneyên cihanî da nusxe û tercumeyê wê dihêne dîtin. Di şî'ra Klasîk da hin caran bêtir ku rasterast amaje bi van herdu kitêban bihêne kirin, navê van berhemên tinê bi tenasubê ve bi wateyên xwe yê luxetî ve dihêne bikarînan. Hin caran jî ew rasterast wek navên du kitêban hatine gotin û navê şa'irê wan jî hatîye zikirkirin. Têkilîyên edebî yê li dor van herdu kitaban exleb di navbera “rûyê yarê” û “gulistan”ê da dihêne saz kirin û bikarînan navê *Gulistanê* jî ji bo falan, bo cildên kesk yê kitêba *Gulistanê* û bo kirasê yarê û têkilîyên mezmûnî yê di vê çarçoveyê da dihêne dîtin (Kurnaz, 2003, r. 66-70.)

Baharistana Mela Camî (mr. 1492) nezîreyek e bo *Gulistan* Se'dîyê Şîrazî. Ev berheme jî ji ber navê xwe zêdetir di konteksta mezmûnê ku bi biharê ve têkildar in dihête bikarînan. Bi taybet têkilîya teşbîhên li ser rû yan jî unsurên dî yê bedena yarê ve girêdayî ne, digel bihar û biharistanê dihêne vegotin. *Mantiqu't-Teyra* Ferîduddîn 'Ettar (mr. 1221) jî yek kitêbeke girîng ya edebîyeta Farsî ye ku exleb ji bo têkilîyên di navbera mezmûnên wek “teyr” û “gulistan” û “çemen” yan jî ji bo yê wekî “Silêman Pêxember” û “teyr” dihête bikarînan. Herwisa *Mehzenu'l-Esra* Nizamîyê Gencewî (mr. 1214), *Metle'u'l-Enwara* Emîr Xusrewê Dehlewî (mr. 1325) ji bo “rû”, “sûret” û “gerdena yarê” digel têkilîya bi “gul” û “qedeh”ê hatîye bikarînan (Kurnaz, 2003, r. 66-75). Hin kitêbên dî hene ku herçend navên wan wekî van

berhemên navborî rasterast nehêne gotin jî ew metnên bingeîn û girîng in. Di wan lîsteyan da rasterast neborîna navê wan ji ber hin sebeban e. Çunku hind ji wan kitaban exleb girêdayê mijarê ne hind jî girêdayê şekl û awayê şî'rê ne. Anko eger mesnewîyeke evînî bihête nivîsîn, muellif exleb wek şerteke kanonîk, behsa Nizamî û Camî û mesnewîyê wan diken ku lêre da qest hem şa'irtîya wan e hem jî berhemên/mesnewîyên wan in. Lewra ev herdu nav—herweku di *Mem û Zîna Ehmedê Xanî* da jî diborin—serekanîya mesnewînivîsîyê hatine dîtin û şa'irên pabendê kanona vê şî'rê bivênevê yanî bi şiklekî xweber navê wan şa'iran zikir kirine.

Herwisa di konteksta întertekstualîtîyê yan jî mijarên wek nezîreyê da navê kitaban derbas nebin jî ji ber “milmilana di navbera wan metnan da” xwûnerê vê şî'rê dizanît ka şa'ir milmilanîyê digel kêşk kitabê diket. Bo nûmûne destpêka gelek nusxeyên *Dîwana Melayê Cizîrî* bi şî'ra ewil ya *Dîwana Hafîzê Şîrazî* ye destpê diket. Yan jî şa'iran, meseleyê ku Mewlana di *Mesnewîya* xwe da vegotine bi şêweyeke dî tekrar kirine yan jî ji nû ve vegotine. Ji ber wê jî metnê weku *Dîwana Hafîzê Şîrazî* û *Mesnewîya Mewlana* girîng in ku navê wan neborin jî dîyar e ku şa'ir amajeyê bi wan metnan diken. Helbet tiştê vê yekê dîyar diket, kanon û nerîta vê şî'rê ye ku awa û şeklê şî'rê jî wê yekê li ber şa'irî mecbûr diket. Yanî referansa di xezelê da yan qesîde û mesnewîyê da ji hevûdu cuda dibin jî di her warî da behsa şa'irên pêşeng û navûbang dihêne kirin berhemê wan bi gelek şêweyan ve di nav şî'ran da diborin.

Ji alîyê dî ve hind berhemê kanonîk hene ew tinê di nav kanoneke tengtir ya ji derveyî-Farsî anko di nav zimanê/debîyatên xwemalî da dihêne dîtin. Bo vê yekê jî mirov dişê ji edebîyatên Kurdî û Tirkî mînakê bidet. Bo nûmûne *Dîwana Melayê Cizîrî* li ser temamê şî'ra Klasîk ya Kurdî tesîr kirîye û *Mem û Zîna Ehmedê Xanî* jî bi taybet li ser mesnewîyên Kurdî tesîreke wesa kirîye. Heman tişt di edebîyata Tirkî ya Klasîk da jî dihête dîtin ku ew hem ji têkilîya întertekstualîtîyê hem jî ji tezkîreyan dîyar dibît.

Kitabên edebî li alîyekê, kitêbên li ser 'ilmên dînî yên wekî tefsîr, tesewwûf û 'irfanê û herwisa berhemên li ser tîbb û babetên dî jî di şî'ra Klasîk da wek metaforekê hatîne bikarînan. Jibîlî metnên edebîyatê, ji bo çend berhemên navdar jî mirov dişê mînakê wek *Keşşafa Zemehşerî* (mr. 1144) û *Qanûn* û *Şifaya* Ibnî Sîna (mr. 1037) bînin. *Keşşaf* jî ber ku tefsîra *Qur'anê* ye û xett û ayet li ser rûpelên wê berhemê hene, ew kitab jî bo konteksta di navbera mezmûnên “keşf” û “xettên li ser rûyê yarê” û “ayet” û “haşîyeyên li ser rûpelên wê tefsîrê” da hatîye bikarînan. Herwisa *Şîfa* û *Qanûn* jî zêdetir bo wateyê wan yê luxetî dihêne bikarînan (Kurnaz, 2003, r. 76-77) ku em dê mînakê wan yê di *Dîwana Melayê Cizîrî* da diborin, li jêrî bi berfirehî vebêjin. Lê berîya wê em çend mînakê wan yê di şî'ra Tirkî ya Osmanî da biden da ku bi wê muqayeseyê nûmûneyên ji *Dîwana Melayê Cizîrî* çêtir bihêne fêmkirin.

Divêt mirov ji çend perspektîfê cuda *Dîwana Melayê Cizîrî* û *dîwana Bâkî* muqayese biket. Lewra hem serdemên wan nêzik yek in hem jî têkilîyê wan herdu şa'iran digel desthilatdarên wê demê balkêş û guncav in ku mirov berawerdkirina xalê balkêş yê wan herdu berheman biket. Lê ger em tinê li dor mijara vê gotarê lê hûr bibin jî, dîsa dê numûneyên enteresan yên li dor kitabê û mînakên balkêş yên di şî'rên van herdu şa'iran da dîyar bibin. Wekî ku dihête zanîn, Bâkî (1526-1600) şa'irê navdar yê edebîyata Tirkî ya Osmanî ye ku ew di dewra Kanûnî Sultan Suleyman (1520-1566) da jîyaye. Ew di van beytên xwe da sipasîyên xwe hosa pêşkêşî Sultan Suleyman diket, ji ber ku siltanê wî çend kitab dîyarî dane wî:

Eyledi **[K]eşf** ile izhâr-ı kerâmet keremün⁴

İtdi müşkillerimiz hâce-i ihsânun hall

Kime kim rehber ola bedreka-i ihsânun

Yolina karşı tutar şem'-i **[H]idâyet** meş'âl

Gerçi kâmillere âlemde nihâyet yokdur

Minnet Allah'a seni cümle etmiş **[E]kmele**. (Tökel, 2023, r. 46)

Wekî ku dihête zanîn û Muallim Nâcî jî neqil diket, qesta ji *Keşfê*, tefsîra meşhûr ya Zemehşerî ya bi navê *Keşfî Keşşafe*. Ji *Hidayetê* jî qesta Bâkî, kitêba Burhaneddîn bin Ebubekr Merginânî *Hidaye* ye, ya ku li ser fîqhê hatîye nivîsîn. Herwisa *Ekmel* jî navê kitêbeke di ya tedrîsata medreseyê ye ku mijara wê jî li ser fîqhê ye (Muallim Nâcî, 1986, r. 34-35).

Di edebîyata Kurdî ya Klasîk da Melayê Cizîrî jî hevdemê Bâkî hesab e ku serdemê wan nêzik yek in û hetta ji gelek alîyan ve herdu şa'ir rengê yekûdu diden. Bo numûne çawa ku Bâkî unwanê “Sultanu’ş-şuara”yê wergirtîye herwisa Melayê Cizîrî jî—herweku di hindek nusxeyên *Dîwanê* da diborît—bûye xwudanê unwanê hosa ku yek ji wan “Sultanu’l-‘Aşîqîn Şêx Ehmed el-Cizîrî” ye (Amêdî, 1977, r. 622-3; Tek, 2024, r. 23). Wekhevî û xalên hevpar yê herdu şa'iran girîng in. Lê em dê lêre zêdetir li ser konteksta mezmûna kitabê rawestin û wekhevîyên van herdu şa'iran tinê di vê babetê bibînin. Ji mînakê li jêr dê dîyar bibît ka Melayê Cizîrî, wekî Bâkî, navê kîşk kitabê çawa îname. Lê xaleke di ya derbareyê Bâkî û dîdgeha kitabê da ew e ku divêt bibêjîn, ew hersê kitabên li jorê navên wan borî û Sultan Kanûnî dîyarî bi şa'irî kirî di eslê xwe da siparîş û daxwaza şa'irî bi xwe bûne. Lewra herwekî dihête dîtin Bâkî ji bo peydabûna wan kitabê ji bo Kanûnî medhîyeyek/sipasnameyek nivîsîye ku uslûba vê şî'rê gelek rengê medhîyeya Melayê Cizîrî didet ya ku bi rêza “Ey şehinşahê mu‘ezzem Heq

⁴ Di numûneyê beytên Tirkî da me xwe têkil imlaya wan nekir, anko me ew bi imlaya Tirkî parastin.

nigehdarê te bî” destpê diket. Melayê Cizîrî hay ji şî'ra Bâkî çêbûye yan ne, behseke dî ye, lê herdu medhîye jî bi “Ey şahinşeh...” destpê diken ku herdu jî ji bo hamîyê xwe hatine nivîsîn. Melayê Cizîrî di medha xwe da “padişahên heft iqlîman” wek selamkarê mîrê xwe û “çîmena siltanîyê” û “gulşena haqanîyê” weku lale û xareke di nav baxê mîrê xwe da dibînît (Melayê Cizîrî, 2012, r. 178-182). Bâkî jî bi teswîra “kitêbxaneyên dîn û milletan bi kitabên medha padişahê wî ve tijî diken” medha xwe hamîyê xwe hosa vedibêjit:

Ey şehen-şâh-ı kerem-güster ü dâniş-perver

Sâye-i lütf-i Hudâ pertev-i envâr-ı ezel

...

Ola vasfunla müzeyyen safahât-ı eyyâm

Tola medhûnle kütüp-hâne-i edyân u milel (Kaplan, r. 2021, r. 85-86; Tökel, 2023, r. 48). Ev yeke jî nîşan didet ku di şî'ra Klasik da kitab ne tinê nesneyeke zanîne bûn. Herwisa ji ber ku zanîn bi xwe nîşaneyê hêzê bû, kitab, kitêbxane û xwudanbûna kitabê, şert û îşareta iqtidarbûnê bûn. Bi heman awayî Melayê Cizîrî di biwara têkilîya patronaja di navbera xwe û mîrê xwe da gava medha mîrê xwe diket, ew jî metafora kitabê bikartînît. Lê ew kitab dîsa rasterast *Qur'an* bi xwe ye. Lewra Melayê Cizîrî—di qesîdeya xwe ya meşhûr da ya bi “Xanê xanan...” destpê diket—hamîyê xwe wek “fatih”ekî dibînît û dixwazît ew bi sûre û ayetên *Qur'anê* yên wekî Ayetulkursî, sûreya En'am û Fatiheyê bihête pîrozkirin û parastin:

Ayetulkursî û En'am heykela canê te bin

Rayeta fethê bi nesra lem yezel menşur bî

Xîmeya nûrê 'inayet zillê memdûda te bit

Sûreyê “Ummilkıtab” madarê hezret sûr bî (Melayê Cizîrî, 2012, r. 182)

Melayê Cizîrî di qesîdeya dî da jî—ya li ser heman mijarê ku medhîye ye bo mîrê wî—hîvî diket ku *Qur'an* mîrê wî biparêzît. Lê di destpêka wê qesîdê da dîsa li ser fetihkirina cihanê, medha hamîyê xwe diket û ji ber wê jî sûreya Fethê zikir diket ta ku hamîyê wî bibîte hakimê cihanê: “Ey şahinşahê mu'ezzem Heq nigehdarê te bî/ Sûreyê “İnna Fethna” dewrê madarê te bî (Melayê Cizîrî, 2012, r. 178).” Bi vî awayî dîyar dibît ku di vê nerîta helbestî da kitab ne tinê nesneyên xwandinê ne, ew hem nîşaneyê estetîkê û iqtidarê ne hem jî berhemên pîroz in ku di vê têkilîya patronajê da di navbera patron û şa'iran da xwudan rol û ciheke girîng in. Çunku wekî ku di hête dîtin kitab bi vî şiklî sembola hêzê û referansa mezinkirina patronan jî bûne û bo vê yekê hatine bikarînan.

3. *Di Dîwana Melayê Cizîrî da Mezmûnên Li Dor Kitabê*

Rehên Edebîyata Klasîk herçend heta serdemên dêrîn biçin û mijar û motîfên qedîm di vê edebîyatê da bihêne vegotin jî esasen ew, nav çandêke dariştî ya piştî Islamê ava bûye. Ev edebîyate piştî serdemên ku çapxane têde belavbûne jî berdewam bûye, geş bûye û pêşkeftîye. Lê wek tradîsyoneke eslî ya vê edebîyatê, kitab, zêdetir bi rêya destxetan û bi kopyayên wan belav bûne. Xusûsen di edebîyata Kurdî da gelek ji wan berhemên aidê vê edebîyatê—kêm tê nebin—bi destan hatine nivîsîn. Loma jî çanda kitêbî ya qedîm di edebîyata Kurdî ya Klasîk da serdest e û wê çandê tesîr li ser form û naveroka berhemên vê edebîyatê jî kirîye.

Di Edebîyata Klasîk da mijara eslî ‘eşq e ku ji ber wê jî wesfên dildara hatiye îdealîzekirî ciheke giring digirît ku mezmûnên li dor metafora kitabê jî xwedan têkilî ne digel wan wesfên dilberê. Ji ber wê yekê yara ku di nav kanona vê şî‘rê da mucedsembûyî û her dihête wesfêkirin, digel xwe estetîkek jî saz kirîye. Di çarçoveya wê estetîzekirinê da mezmûnên cuda hatine dubarekirin ku bi bikarînan wan mezmûnan jî şa‘iran şarazahîyên xwe der kirine. Di nerîta şî‘ra Klasîk da yar yareke xeyalî ye û ji ber wê jî xemilandin/sêwirandina wê yara xeyalî bi bikarînan îmajên nû ve pêşve diçît. Wêca ne tinê di edebîyata Kurdî ya Klasîk da belkî di temamê vê nerîtê da şî‘ra Klasîk zêdetir li dor îmajên derbareyê rûyê yarê hatiye îşakirin.

Yar ji alîyekê ve yareke xeyalî/mute‘al e û ji ber ku şa‘ir jî neşet xwe bigehînitê, şa‘ir bi rêya îşakirina van îmajan ve yarê ji dinyaya rastîyê dûrtir diket. Di çanda vê şî‘rê da yar ji hemû kêmasîyan dûr û munezzeh e û hetta ew, xwedan bedeneke—wucûdeke—mukemmel e. Ji ber wê yekê, herçend teswîreke giştî hebit jî her îmajek bi serê xwe dihête dîtin. Yanî ji kompozisyoneke giştî wêdatir, hebûna mezmûnên tekane û kompozîsyona li dor mezmûnan pêşdatir e. Loma jî estetîka vê şî‘rê li ser xweşîkbûna mezmûnê hatiye avakirin. Li ser rûyê yarê her unsureke rûyî bi serê xwe xwedan referansên cuda ye ku bo numûne zulfa yarê reş e, wek ejdeha/reş-mar e, dişibîte herfa lamê û li ber derê xizîneyê—dev û lêvan—dergevan/mar e û hwd. Bi vî şiklî zulf bi xwe têkileyekê digel mezmûnên dî çêdiket û di encama wê da jî bi serê xwe kompozisyonekê ava diket. Yanî ji vî alî ve her mezmûnek musteqîl e û xulase teswîra giştî ya yarê li ser wan mezmûnên serbixwe dihête avakirin. Wêca yek ji girîngtir mezmûnên li ser teswîra rûyê yarê “xett” e ku em dê di vê beşa vê xebatê da li ser mînakên xezelên Melayê Cizîrî rawestin û di wan xezelan da îşakirina “xett”î di nav nerîta şî‘ra Klasîk da îzah biken.

Herwekî ku bi aşkerayî dihête dîtin Melayê Cizîrî weku şa‘irekî mutesewwîf gava meseleya ontolojîyê anko hebûna/wucûda xwe vedibêjit, wan bi termên nivîs û kitabê izah diket. Lewra wekî ku em dê li jêr jî bibînin, Melayê Cizîrî afirandina ‘alemê wekî tertîbkirina kitabekê teswîr diket ku insan bi xwe jî ‘alemek e û wucûdbûna insanî jî wekî îşaya metnekê hatiye behskirin.

Loma Melayê Cizîrî bersiva “kî-bûna xwe” li ser însaya kitabê didet. Lewra di nêrîna ontolojîk ya Melayê Cizîrî da têkilîyên xurt di navbeyna “adem”, “esma”, “‘‘‘alem”, “‘‘‘ellem”, “imla”, “kelîmat” û “me‘na”yê da hene:

Herfên reqemê lewhê wucûda me bixwan

Da qenc bibînî ku çi Mella yim ez

Barî ji we ‘ellemê ku xebardar kirîn

Îro tu bizan Ademê **esma** yim ez

Zahir tu perîşanîyê zatê me mebîn

Mecmû‘ê di zatê xwe û **tuxra** yim ez

Înşayê ‘ulûman li dinê ger tu nizanî

Zanî bi heqîqet ku çi **îmla** yim ez

‘Alem çi ye î‘rab û hurûf û kelîmat

Ew **lefze** di nefsa xwe û **me‘na** yim ez

Tu ji **nusxeyê tewhîdê** vexwûn **ayetê** nefyê

Bê ayetê îsbat ku “illa” yim ez (Melayê Cizîrî, 2012, r. 96)

Di şî‘ra Klasîk da fikra tesewwûfê bingeha eslî ye ku di vê nêrînê da ‘eşq ji her tiştî pêşdatir e ku yar jî li dor wê tesewwûrê dihête însa û teswîrkirin. Ji bo wê jî sembolên ji her alî ve hatine wergirtin û ew ji bo teswîr û vegotina yarê dihêne bikarînan. Ji wan sembolan jî yên li ser kitabê em gelek caran di *Dîwana Melayê Cizîrî* da dibînin ku li jêr em dê mînakên wan biden.

3.1. *Qur’an*, Kitab û Mishef

Mexlesa Melayê Cizîrî “mela” ye anko ew kesê di warê zanîna dînê Islamê da xwedan zanîn û otorîte. Herwisa Melayê Cizîrî xwe wek “muftî” tewsîf diket ku ew sifet jî dîsa desthilatdariya wî ya di warê dînî da destnîşan diket. Digel wê, ger agahîyên derheq jîyana Melayê Cizîrî da rast bin ku wî muderristî li Medresa Sor kiribît, ew bi rastî jî zanayekî dînî bûye. Divêt nehête jîbîrkirin ku li ser Melayê Cizîrî û *Dîwana* wî bêguman Hafîzê Şîrazî tesîreke zêde kirîye ku peyva “hafîz” jî dîsa têkilî heye bi Islamê û kitaba vî dînî *Qur’anê*. Wêca Melayê Cizîrî hem ji alîyê kanona edebî ve hem jî ji alîyê zanîna dînî ve xwe wek desthilatdar dizanît û xwe wesa pênase diket. Loma jî *Qur’an* di nav helbesta Melayê Cizîrî da hêmayeke girîng e. Ew yek ji ber hakimîyeta Melayê Cizîrî ya derbareyê ‘ilmên dînî ye. Ji alîyê dî ve jî Melayê Cizîrî wekî

şa'irekî şî'ra Klasîk, di çêkirina îmajên vê şî'rê da bi awayekî serkeftî ji *Qur'anê* istifade kirîye. Bi taybetî referansên li ser 'ilmên li dor *Qur'anê*, hakimîyeta li ser zimanê 'Erebî û naveroka *Qur'anê*, di *Dîwana Melayê Cizîrî* da bi aşkerayî dihêne dîtin û ev mînakên ku em dê biden, di vî warê da gotinê me dupat dikan.

Di *Dîwana Melayê Cizîrî* da kelîmeya *Qur'anê* rasterast du caran diborît û du caran jî “mishef” derbas dibît. Dîsa di me'naya *Qur'anê* da kelîmeya “kitab”ê diborît û herwisa kelîmeyên li dor *Qur'anê* yên wekî “ayet”, “Fatihe”, “sûre” û “tefsîr” jî derbas dibin. Melayê Cizîrî wextê behsa sûreya Fatiheyê diket wê wekî “Ummilkıtab” bi nav diket. Dîsa îbareyên *Qur'anê* û navên sûreyan jî di *Dîwanê* da rasterast derbas dibin ku “Ayetelkursî”, “En'am” û “sûreya îna Feteħna” çend mînak in ji wan. Herweha Melayê Cizîrî kelîmeya “nusxe”yê jî bi wateya *Qur'anê* bikartînît. Wekî şa'irên di Melayê Cizîrî jî bi rêya tewrîyeyê gelek kelîmeyan ji bo çend wateyên cuda bikartînît ku ji wan yek jî “kitab” e. Melayê Cizîrî peyva nusxeyê jibîlî *Qur'anê*, ji bo tebîetê jî bikartînît ku di wê kitabê da jî ayet hene. Di *Dîwanê* da rengvedanên wan metaforan em dê li jêr rêz biken ku ka Melayê Cizîrî, *Qur'an* û unsûrên di yên li dor wê çawa bikarînan.

Melayê Cizîrî di *Dîwanê* da hem li ser *Qur'an* û ayetên wê hem jî li ser Mishefê sûndê dixwet. Wekî ku dihête zanîn di çanda vê şî'rê da mîlmilanêyek di navbera rind û zahidî da heye. Kesê ku zahid e—anko hişkedîndar û tundrew e—di şî'ra Melayê Cizîrî da jî dihête şermizarkirin. Wêca gava Melayê Cizîrî li hember wî û fikrîyata wî xwe û rindan diparêzît û berewaniya xwe bi *Qur'anê* û çavkanîyê dînî diket. Bo numûne, Melayê Cizîrî di murebbe'aya nezîre da ya ku li ser xezela Hafîzê Şîrazî nivîsî, li meşru'iyeta secdebirina hember putan bi *Qur'anê* pesend diket ku ew û şa'irên wekî wî wê tezatê bi hostayî hosa bikartînin: “Bi *Qur'anê* bi **ayatê**, eger pîrê xerabatê/ Bibê, secde biben latê, murîdî er bibey qatê (Melayê Cizîrî, 2012, r. 229).”

Dîsa herwekî beyta jorî, Melayê Cizîrî di konteksta dijberîya mescid û meyxaneyê da jî, ji bo ku şahidîyê bo ehlê meyxaneyê/muxbeçeyan biket, bi Mishef û bi ayetê sûndê dixwet. Şa'ir gava sûnd dixwet xwe jî wek şahid nîşan didet ku wî wek “mela” bi xwe bi çavên xwe dîtîye ku ka muxbeçe çawa camê digêrînin: “Feyda 'ulûmê hikmet cama sedef ku gêra/ Me j' destê muxbeçan dît bi **Mishef** û bi **ayet** (Melayê Cizîrî, 2012, r. 52).”

Herweha Melayê Cizîrî di çarçoveya ku rûyê yarê û cindîtîya wê bişibînîte kitabê dîsa hem kelîmeya “mishefê” bikartînît hem jî ji bo wê iddiaya xwe sûndê bi *Qur'anê* dixwet ku di vê numûneyê da me'naya sûret/rû û me'naya kitabê di nav hev didet. Bi vî şiklî hem bedewîya rûyê dilberê hem jî unsurên li ser rûpelê destxetekê dihêne bîra mirovî. Anko bi heman

kelîmeyan me'nyên cuda saz diket: “**Mishefa** husn û cemalê sûreta **xal** û **xetan**/ *La telewna xeyre herfî “la” we Qur'anin Mecîd* (Melayê Cizîrî, 2012, r. 84).”

Divêt nehête jibîrkirin ku *Qur'an* bi xwe jî di ayetên ku ewilîn nazil bûne da balê dikêştê ser xwandin û nivîsînê. Lewra di sûreya ewil hatî anko sûreya ‘Eleq da, emrê xwandinê “iqra” heye û sûreya dûv ra hatî jî sûreya “Qelem”i ye. Helbet di destpêka serdema şî'ra Klasik da û di hizra şa'irên vê şî'rê da *Qur'an* kitabeke pîroz e. Lê jibîlî wê rastî û bawerîyê, îşareta di ayetên wê yê ewil da ya ji bo qelem û xwandinê hatine kirin jî dîr nîne ku tesîr li ser wan şa'iran kiribît ku ew şa'ir, kitab û qelemî di kontekstên wesa yê cuda da bikarbînin. Lewra *Qur'an* bi xwe metnê sereke yê kanonîk yê vê şî'rê bû.

3.2. *Erjeng, jeng/zengar, katib, misk û xubar*

Manî û kitêba wî *Erjeng* di *Dîwana Melayê Cizîrî* da wesa hatîye îşaretkirin ku Melayê Cizîrî mezmûnên li dor vê kitabê hin caran rasterast neqil diket û behsa wan diket û hin caran jî dixwazit xwûner bi mezmûnên dî ve wan biînine bîra xwe. Di van rêzên jêrî da di berêkdana di navbera Mîr û Mela da hem Mîr hem jî Melayê Cizîrî behsa xettê reyhanî, Manî û sûret û neqşên Çînê diken. Ustadên ressam yê ku di *Xusrew û Şîrînê* da sûretên Şîrînê neqş kiribûn, katibê xeybê anko Xwedê, herwisa Yaqutê navdar ku ew di xweşnivîsiya Islamî da naveke girîng e û ew wekî babê hunera xettî dihête zanîn, di van beytên Melayê Cizîrî da diborin ku em dê li jêr behsa wan biken. Helbet wekî şa'irên dî Melayê Cizîrî jî gava behsa Manî û tablo/xettên wî diket, “xet” û “xeta”yê û kêşana xettî û bi xeta kêşana xettî û unsurên dî bi hev re bikartînit.⁵ Bi vê yekê Melayê Cizîrî li ser wê “xetaya Manî”, li hember xettê xwe, dildara xwe û mîrê xwe “kêm dibînit” û li ser wê kompozîsyonê heza şî'ra xwe ava diket. Digel wê yekê Mîr jî xettê Manî bi kêşana “bi xeta” tewsîf diket ku wî “kêm û bi xeta” dibînit û resmên sûretê Şîrînê diînite bîra mirovî:

Mela:

Şeraba nabê rummanî şefeq da ‘iqdê perwînê

Muselsel maye **reyhanî xetê nazik** li nîsrînê

Xerez **şîklê** te bû **Manî** ji **neqşên Çîn û Maçînê**

⁵ Ev meseleya kêşana xetayê—anko têkîlya di navbera kelîmeyên “xett” û “xeta”yê da—mezmûneke meşhûr e di nav şa'iran da. Annemarie Schimmel wê yekê wisa vedibêjît: “xettê xeta” (herfên bi xeta/xelet) û “xet” (zulfa zirav, tişta şorbûyî) di serê şa'iran da dibûn sebebê tevliheviyê. Çunku wan hizir dikir ku gava ew xetê yarê anko mûyên li dor dev û lêvê yarê binine bîra xwe dê deftera/kitaba emelê wan reş bibît (Schimmel, r. 2020, 368).” Yanî bi hizirkirina mûyê ziravoşk yê li ser rûyê yarê dê mishefa wan reş biket.

Mîr:

Mîsalê **sûretê Çînê** xelet **Manî xeta** kêşa
 Ku min dîbû li ayînê ji ber zulfa du ta kêşa
 Me dîbû **şiklê Şîrînê** çu **ustadan** we **nakêşa**

Mela:

Ku **kêşa katibê xeybê xetek reyhan** li **kafûrê**
 Çi **ayet** bû ji la reybê **reşandî** qudret û nûrê
 Di **yaqûta** me dê mey bê bi **nîşan** sifethorê (Melayê Cizîrî, 2012, r. 206)

Wekî ku me li jorê jî behs kirî, têkilîya reng, sûret, nîgar û kitabê digel afirandina bedewtîyê/estetîkê heye. Wêca vê estetîkê bi taybet têkilîyek ligel xweşikîya rûyê yarê heye ku temsîla wê estetîkê ya şênber jî tablo, resm û nîgarên ressamên Çînî ne û bi xêra berhemên wan ew estetîka îdealîzekirî di wan da xuya dibin. Ji ber hindê jî Melayê Cizîrî, mezmûnên wek “katib/neqqaş/ressamê ezelî” di heman me‘nayê da bo Xweda bikartînît ku ka Xweda kainat bi sûret û neqş û hebûn çawa mukemmel û bêxeletî afirandîye: “**Nusxeya** ‘alem hemî ‘unwanek e/ **Nuqtetek** nabit di ‘unwanê xelet (Melayê Cizîrî, 2012, r. 114).” Bi heman şiklî numûneyên ku sûretê wan hebûnên Xwedayî jî yên wekî rûyê yarê yan jî eksên wê yên di *Erjengê* da bi heman şiklî kopyayên wê mukemmeliyetê ne. Melayê Cizîrî gava van herdu “afirandinan” di heman kontekstê da didet, ji teknîkên ressamîyê yan jî şêweyên çekirina destxet û kitaban istifade diket. Loma jî wan hemû me‘nayên cuda di yek kompozîsyonê da digehînîte wehdetê. Wêca di şî‘ra Melayê Cizîrî da bi rêya herdu wateyan anko hem Xweda—katibê ezel—hem jî katib û neqqaşê sûretan, me‘nayên mecazî û rastî diçine navîyêk ra. Lewra çawa ku Xweda ev ‘aleme afirandîye û estetîze kirîye, ressam sûretan çêdiket û katib jî bi perkarî kitaban estetîze diket. Xweda di vê ‘alemê da insan ji sûretê xwe çekirîye, ressam û katib jî di tablo û kitaban da rûyê yarê dineqşînin û li ser sûretên yarê jî zêr, zûbad û miskê dirêşînin. Bi vî şiklî xaliqîya Xwedayî û ya hunermandan di nêrîna Melayê Cizîrî da digehine hev û ew bi heman wateya şî‘rane di yek kontekstê da dihêne vegêran. Wekî di numûneyên li jorê jî hate dîtin, Melayê Cizîrî ji bo ku wan kontekstan ava biket, bi kelîmeyan dileyîzît. Anko ew hej wê bazîya kelîmeyan diket ku xett, xelet û xetayê pêkve bikartînît:

Katib di neqşê qudretê zêr reşande ser xet
 Erzen û dêm û cebhetê lê **neqîşand** û kir **nuqet**

Cebhet û dêm **neqqîşand misk û zûbad lê reşand**
 Nûrê ji zulmetê **reşand taze kîşand xet bi xet**

Hûr û ferîşte kes we dîn nazik û xûb û surşîrîn

Nîm numûne pir biçîn **sûretê Çîn numa xelet** (Melayê Cizîrî, 2012, r. 110-112)

Sûret û rûyê yarê di vê şî'rê da wekî rûpelê kitabeke pîroz dihête dîtin û teşbîh jî li ser wê yekê dihêne çêkirin. Ji ber wê jî têgehên hunera kitabsazî û bergsazîyê, têgehên ressamîyê digel afirandina rûyê dildarê—şahidê—têkelê hev dibin. Rûpelên kitabên bi taybetî jî kitabên pîroz û bi qedr, li ser kaxezên giranbiha ji destê katibên/xettatên baş dihêne duristkirin û paşê jî neqş li ser wan dihêne çêkirin û ji alîyê katiban ve bêhnên xweş û toz û xubarên ji zêr û sîman li ser wan dihêne kêşan û rêşandin. Yan jî bêhnên xweş yên wekî rihan û miskê têkelî hibrê dikirin da ku xettê kitabê/tabloyê hem xweşik bin hem jî bêhnexweş bin. Bi vî şiklî kitab wek nesneyeke estetîk û pîroz ji destê hunermendan derdikevît ku gava destxetek bi vî şiklî dihate çêkirin ew bêqusûr û bêxeta dibû. Ji ber wê, sûretê yarê jî bi heman şêweyî hatîye çêkirin ku çawa rûpelên kitabeke weto berkeftî yan jî resmeke bêqusûr ji destê ressamekî ve derketîye û bûye portre. Yanî çawa ku Xweda insan ji sûretê xwe afirandîye, katib û ressam jî hunera Xwedayî teqlîd diken yan jî eksa hunera Xwedayî di çavên me da dubare diken.

Wekî ku ji van beytên li jor jî dîyar dibît, Melayê Cizîrî wateyên çend-laye û çend-tebeqe bikartînit ku di wateya ewil da eger em katibî di me'na Xwedê da bifikirîn, Xweda ji qudreta xwe rûyê yarê—çawa katibek bi qelemî rûyê wê bêqusûr xêz diket—wesa xweş afirandîye. Ji alîyê dî ve bi wateyeke dî, ger em wê afirandinê wekî karê katibekê bibînin û rûyê yarê jî wekî kitabekê bifikirin, hingî jî katibî ji neqşê qudretê rûpelên kitabê çêkirine û ew xettên/nivîsên li ser wan rûpelan bi xweşîkî nivîsîne, nuqte bi nuqte ew xweş kêşane û paşê jî li ser wan nivîsan/xettan zêr rêşandîye. Wekî ku me behs kirî, di karê destxetan da kitabên girîng ku bi siparîşan ve dihatin çêkirin, ji bo ku berhem xweşîktir û dewlemendtir bibin hinek toz û xubarên bêhnexweş û giranbiha dihatine rêşandin. Wêca di van beytan da jî Melayê Cizîrî wan hemû wateyan bi hev re nîşan didet. Helbet di van beytan da yek xala girîng jî ew e ku têkilîya di navbera xettên li ser rûpelan û xettên yanî mûyên zerik û kesk yên li ser rûyê yarê ne. Lewra di vê şî'ra Klasîk da xett, ji bo herdu wateyan dihête bikarînan ku teşbîha nivîsên biçûk yên li ser rûpelên destxetan ji bo mûyên kurt û nabîna yên li ser rûyê yarê dihêne bikarînan. Wêca çawa ku li ser rûpelan ew tişt—zêr, misk û zûbad—dihatine rêşandin wek maddeyên kozmetîkê jî li ser rûyên yarê bi taybetî li ser wan mûyan/xettan misk dihatine rêşandin. Ji alîyê dî ve ew mûyên yarê yên hûr tim di vê şî'rê da bi bêhna misk û 'enber û reyhanê ve dihêne vegotin. Rûyê yarê yan wekî perê kitabê spî ye yan jî wekî sîmî dibiriqît yan jî wekî nesrînan spî ye. Wêca mûyên li ser wî zemînê ron û spî—yê wekî bedr û Zuhreyê—bi xwe reş in û herwisa wekî misk û enberê bêhnexweş in. Helbet ew kompozîsyona teşbîhê, perê kitabê jî dîinîte bîra mirovî ku rû û perê kitabê têkil hev dibin:

Kifş e me'na kî li **lewhê sîm** dî

Nuqteyê misk û xetê 'enber 'ebes (Melayê Cizîrî, 2012, r. 62)

Daneyên 'enber li **nistrînan reşandî dam dam**

Sosinên nazik li ser **xalan çevandî** dam dam

Cebhet û dêmê ji qudret pê nivîsî herf herf

Kagulan ta ta li ser herfan kişandî lam lam (Melayê Cizîrî, 2012, r. 128)

Hem bedr û hem Zuhr[e] ye dêm hem ji **'alema kubra ye dêm**

Xweş destxetek tuxra ye dêm herfan ji miskê reş reşîn

Lewhê ji nû sîqal beden her [ji] nû ve **xal** beden

Da dil bi yekdî pal beden nuqtan ji **zêravê** weşîn

Zulfa sîyeh 'enber bike xemlê ji **zêrê zer** bike

Zerbav û dîban ber bike **misk** û gulavê lê reşîn (Melayê Cizîrî, 2012, r. 130)

Di şî'ra Klasîk da rûyê kamil yan jî yê îdeal her dem ji alîyê ressamên Çînî ve hatine çêkirin. Lewra hunerên ressamîyê digel Çînê dihêne vegotin ku navdarê wî karî jî neqqaşê kitaba *Erjengê*, Manî ye. Wêca Melayê Cizîrî li hember numûneya herî xweşik ya hunera ressamîyê anko *Erjengê* û tabloyên di wê da rûyê yarê bikartînit. Divêt nehête jîbîrkirin ku di nezera şa'irên şî'ra Klasîk da *Erjeng* û berhemên ressamên Çînîyan bê qusûr in û xeta di wan da nahête dîtin. Lê di nezera Melayê Cizîrî da li hember xweşikîya rûyê yara ku ew behs diket, tabloyên Manî bi xwe pûç dibin. Anko ger yar rûyê xwe hema bi nîvkî nîşan bidet, tabloyên Manî li hember wê bedewîya wî rûyî dê di nav tarîyê da bimînin û dê xeletîyê wan neqşan dîyar bibin. Bi wî şiklî li ser pilleya herî bilind ya estetîk ve bedewîya îdeal ya li ser rûyê yarê dihête însakirin.

Dema xettên kitab û destxetan bi ava zêr yan jî bi murekkebên taybet—ku têda mexlûd anko avên cuda yên wekî ava zêrî hebûn—ve dihatine nivîsîn, hingî ji bo ku ew rûpelên ter, xettên wê belav nebin û nivîs wek xwe xweşik bimînit û hişk bibît, li ser wan rûpelan toz û xubar dihate rêşandin. Wêca ji bo wê yekê jî jengar anko karê oksîtkirina wan nivîsan pêk dihat û bi rêya wê destxet bêqusûr diman û nûra wan aşkera dibû. Anko heta “xwelî” li ser rûyê wan rûpelan nedihate werkirin ew nedibûne berhemên bêhempa. Anko şebeke kesk li ser wan rûpelan dihate rêşandin da ku ew xweşiktir derkevin ku kelîmeya jengar herwisa ji bo me'denê kesk yê kîmyewî dihête gotin ku ew ji jengê anko asîda asetîk ya asin û sifrî/baqir dihate çêkirin.

Loma Melayê Cizîrî li ser têkilîya wê jengarê û ji ber rengê wê yê kesk û teşhîba bi wê bo mûyên li ser rûyê yarê kompozîsyonekê çediket û dibêjît: “Dîsan li **bedrê katibî kêşa** ji nû **jengarê xet/ Nûrin reşandî** Wahibî der **girdişê pergarê xet** (Melayê Cizîrî, 2012, r. 110).”

Mîrov ji bo têgeheştineke baştir ya li ser kompozîsyona ku Melayê Cizîrî vedibêjît, divêt li şa'irên di vegerît. Di nav tradîsyona vê şî'rê da bo vê mijarê belkî mînaka baş, xezeleka şa'irê Îranî Xaqanî ye. Xaqanî di wê xezela xwe da bi temamî vê kompozîsyonê neqil diket ku mîrov hingî meqseda Melayê Cizîrî jî çêtir fêm diket. Lê divêt em pêşîyê hinek pêşagahîyan biden ku çawa di navbera meha/heyva nûrîn/bedr ya çardeşevî û şevetarîyê da tezatek dihête çêkirin û li ser wê tezatê me'nayeke kûrtir dihête destxistin, rûyê yarê yê wek heyvê jî çawa digel reşatîya zulfan ronahîya xwe didete der. Wêca dewama vê kompozîsyonê ya li ser rûyê kitabê jî heman awayî dihête tetbîqkirin. Divêt nehête jibîrkirin ku rûyê yarê di vê şî'rê da wek meha çardeşevî dihête teswîrkirin û lekeyên li ser rûyê heyvê jî wekî toz û xubara li ser rûyê yarê ne. Lê ew toz û xubar çi ne? Rûyê yarê yê bedew yê wek meha çardeşevî/nûrîn ji bo ku bişet derkevît û eyan bibît, muhtacê şeva tarî ye. Wêca çawa ku heyv muhtacê şeveke tarî ye, di teknîka kitabsazîyê da jî teşbîheke bi vî awayî heye. Anko ji bo ku rûpel yan jî tabloyek xweşîktir derkevît, pêşîyê toza jengê—jengar/zengar—li ser wan dihate werkirin da ku hem ew maddeyên kimyewî têkelê murekkeb û boye bibin hem jî ew mexluda seyyal neherikît û estetîka nivîsê/resmî xirab nebît. Wêca di wê teknîka kitabsazîyê da destxet gava dihatine nivîsîn û hêj murekkeb hişk nebûyî toz li ser dihate rêşandin. Piştê hingî jî bi aleteke bi navê pergarê—cetwel-mester—ew toz dihate paqîjkirin ku hem destxet îdî ji tozê xilas dibû hem jî hunera hostayên wek katib/neqqaş derdikete meydanê. Wêca di vê çarçoveyê da şa'ir Xaqanî wesa wê teknîkê bi kurtasî îzah diket ku yara ku ew behs diket rûyê wê, bê mester û bê pergar di nav xweşikîyê da xweş hatîye kêşan:

Meger fihristê nîkoyî est ân xet

Ke bî-pergâr û bî-mester keşîdî

Be girdê xirmen mâh ez xetê sebz

Zi sed qews û qezeh xwoşter keşîdî (Xaqanî, xezel 347)

Herwisa Xaqanî ew têkilîya di navbera keskbûna xettê li ser rûyê yarê digel xettê sebz û jengarê di destê katib da aşkera kirîye û wê teşbîhê di hizra xwûnerî da ji nû ve saz diket. Ji alîyê di ve ew kelîmeyên “qews û qezeh”ê jî bikartînît ku ew di *Dîwana Melayê Cizîrî* da jî zêdetir bi konteksta keskatîyê dihête bikarînan: “**Kesk** û sor in ji rengê **qews û qezeh**/ Ji serapa **gulav** û **enber** ke (Melayê Cizîrî, 2012, r. 152).” Jixwe Melayê Cizîrî jî bi qesîdeya xwe ya bi redîfa “hudûs”ê ve kelîmeyên “jeng”, “reng”, “neqş” û “nigar”ê di nav vê konteksê da vediguhêzît:

Jeng û rengê hedesê neqşê hudûsê me di dil

Bide ber rendeşê 'işqê ew e qessarê hudûs

...

Da nîgarê xwe bi sed rengî bibînî herdem

Were seyrê bike carek tu li etwarê hudûs (Melayê Cizîrî, 2012, r. 66-68).

Li şûna kitab û mishefê hin caran jî kelîmeya nusxeyê dihête bikarînan ku wek li jorê jî derbas bû, Melayê Cizîrî hem kainatê wek nusxeyekê teswîr diket û wesa dibînit hem jî dilê ku merkeza 'eşqa ilahî ye, wî dilî jî dişibînîte xweşnusxeyekê: "Nûra ji qudret lê du nûn jê ra dinalin erxenûn/ Wer ayeta 'eşqê bixwûn **xweşnusxeyek** mestûr e dil (Melayê Cizîrî, 2012, r. 126)." Digel wê, Melayê Cizîrî wek ku di gelek metnên 'irfanî û tesewwûfî da dihêne dîtin, kewn û kainatê wekî xett û nişaneyê hebûna Xwedayî dibînit ku hudûs û hedes rasterast girêdayî wê nêrînê ye. Ji ber wê jî çawa ku ew resmê ku nişaneyê ressamîyê (yezdanê afîrîner) ye dil jî wekî kewnê, jengê digirît û Xweda wî dilî bi rendeşê 'eşqê teswîye û pak diket. Loma lêre da zêdetir têkilî li ser dilî ye yê ku di ezel da wekî ayîneyekê bû lê paşê ji ber masîwayê jengê girtîye û bi 'eşqê ji nû ve zelal û cêla bûye. Anko ew dilê ji ne-paqijîyan paqij dibît. Dîyar e ku konteksta van beytan di vê çarçoveyê da ye. Lê di nêrîna mutesewwîfan da hebûn tev kitabek e ku tiştên têda jî ayet û nişaneyên Xweda ne. Wêca di kompozîsyona dîyar ya şî'ra Klasîk da ku Xwedê xaliq û ressamê hemû 'aleman e û 'alema ber bi çav jî neqş û nîgarên wî Xwedayî ne. Yanî 'alem wek kitêbekê ye ku divêt ehlê nezer wê bi vî çavî bixwûnît. Loma şerh û şîroveya van beytên jorî yên Melayê Cizîrî—wekî ku Abdurrahim Alkış jî îşaret pê daye (Alkış, 2014, r. 81)—mirov dişê di kompozîsyon û teşbîha 'alem û *Erjengê* da bixwûnît ku di van beytan da qest ji "jeng"ê kitaba meşhûr ya Manî, *Erjeng* bît. Lewra çawa ku Xweda 'alem bi çekirineke estetîk afirandiye wekî wê yekê di nav kitaban da jî *Erjeng* bi wî şiklî bi neqşên xwe ve berhemeke kamil û estetîk e. Anko mirov divêt bi reng û neqşên dinyayê xafil nebit lewra ew xweşik û cezzab in lê li ser dilî jî dibîne jeng. Ew nîgarên estetîk yên Manî jî di kitêba xwe da neqş kirî herwekî cazibeyên dinyaya maddî ne ku divêt insan pê sergerdan nebin. Xulase ev şîroveya ku me ji Alkış neql kirî li nerîta şî'ra Klasîk tam diguncivît. Çunku mezmûnê di van beytan da diborin navbera xwe da têkilîyeke wesa çêdiken ku *Erjeng* bihête bîra mirovî. Lê dîsa jî lêra da îşareta bi "jeng"ê çiqas referans e bo *Erjengê*, pirs û babeteke di ye. Yanî şîrove di cih da yan jî ne li cih, anko her çawa bît xwandineke wesa ya li dor *Erjengê* dîsa numûneyek e bo mînaka kitabeke girîng ya di vê şî'rê da gelek bi navûbang.

Melayê Cizîrî di qesîdeya ewil ya *Dîwanê* da gava behsa tecelleya zatê Xweda diket, 'alem û hebûnê û sirrên wan bi teşbîha "herfan" vedibêjit. Anko 'alem bi herfên Xweda hatîye numûdê

ku ev ‘alem kitaba wî ye ku wî gava tecellîya xwe bê ism û bê asar û bê sifat nîşan da, ew zatê wî di vê kitaba kewnî da “ji sirra hurûfên ‘alîyat” xwe li pişt sirr û perdeyan da veşartîye.

Bawerîya Islamê, li ser bawerîya tewhîdê yanî yekbûnê ava bûye. Ew yek di nêrîna tesewwûfî da jî kûr çûye ku ew yekbûn wek heqîqetê mutleq hatîye vegotin. Lê dîsa jî li ser heman bingehe dualîzmek jî çêbûye ku em wê zêdetir di zimanê mecazî û yê şî'ra tesewwûfî da aşkeratir dibînin. Anko hebûna Xwedayî û wehdeta mutleq, “du alî” hatîye dîtin û vegotin. Lewra di nav yekbûna giştî da, du ‘alemên cuda peyda bûne (‘alema jêr û jor, ‘alema maddî û ya ‘alî/‘ulwî, hebûna erdî û esmanî...). Wêca di çarçoveya wê nêrînê da Xweda li ‘alema bala her tişt neqş û tayîn kirîye ku qeder û teqdîr hingî hatîye dîyarkirin. Lewra Melayê Cizîrî, Xwedayî bi nav û wesfên wî yên wekî Katib, Samed, Cebbar, Wahid, Ehed û Wehhab di wê kontekstê da zikir diket. Herwisa ‘alem hemî esereke ji ayetên wî pêkhatî ye ku wî her tişt afirandîye. Ji ber hindê jî ew hem Katib e hem jî Neqqaş e. Lewra Melayê Cizîrî gava behsa ayet û sûreyên pîroz diket—ku herweha ew cewşen in—behsa sutûrên safîlat diket. Ji ber wê jî neqşa insanî yanî sernivîşt ji alîyê Katib ve hatîye nivîsîn ku insan bi xwe “destxetê Xweda” ye, nusxeyek e ji destê wî katibî derketî:

Zatê tecella bû li zat bêism û asar û sifat

Ji sirra **hurûfên ‘alîyat** xef bû di sirr û perde da (Melayê Cizîrî, 2012, r. 12)

Feyza **hurûfên ‘alîyat** behsê **sutûrên** safîlat

Ayat û wesfên muhkemat tertîbê ‘eşr û sûre da

Katib keşandin ew **hurûf** her talibê lê bit wuqûf

Dê bên ji dil sed ah û ulûf **serxet** li **lewhe** sade da

Ew **destxetên katib** Samed Wahid li **ser lewhe** Ehed

Neqşek reşandî bê‘eded ce‘da cemalê **şane** da (Melayê Cizîrî, 2012, r. 18)

Di vê çarçoveyê da di *Dîwana Melayê Cizîrî* da gelek numûne hene ku têkilîya meseleyên ontolojîk—ku di lîteratura dînî da ew li ser navê “kelam”ê ve hatine kodkirin—girêdidete meseleya vegotina ‘eşqê û vegêrana wesfên yarê. Lewra di nêrîna Melayê Cizîrî da ‘eşq bi xwe jî hêmaneke hebûnê ye ku ew li ser wê paşxaneyê fireh û layeyên cuda da resmeke giştî ava diket ku wekî reng û motîfên cuda resmeke giştî dirêşît. Wêca em ger bihêne ser meseleya kitab û babetên derdora wê, em dê bibînin ku Melayê Cizîrî şî'ra xwe li ser bingeha ontolojîk û estetîzekirî vehandîye. Ji ber hindê jî di şî'rên wî yên ku ew mesele dihêne vegotin da ev kelîme di nav kontekstê da wek mezmûn dihêne bikarînan: “kitab”, “katib”, “nuqte”, “şahid”, “husn”,

“sûret”, “ayat”, “qelem”, “xame”, “kilk”, “tefsîl”, “tefsîr”, “haşîye”, “herf û remzên wan”, “nusxe”, “destxet”, “xett”, “lew h”, “ism”, “tilism”, “(neqş)kêşandin”, “neqqişandin”, “neqqaş”, “nivîsîn”, “înşa”, “cedwel”, “şîkl”, “rêşandin”... Ji ber ku izah û şerha her mezmûnekê karê nivîseke cuda ye em dê tinê li ser têkilîya kitab û rûyê yarê rawestin û di wê çarçoveyê da çend beytên Melayê Cizîrî neql biken. Lê Melayê Cizîrî bi taybet di wê şî'ra xwe da—ya ku di gelek nusxeyên *Dîwanê* da wekî şî'ra ewil hatî ya bi “Ellah sehergahê ezel...” destpê diket—hêbetek mezmûn û metaforên li dor “kitab”, “katib”, “qelem”, “lew h”, “herf” û “sûret”ê bi hev re bikarîname ku mirov dişê evê şî'ra Melayê Cizîrî ji gelek alîyan ve wek kurtêya nêrîna wê nerîta şî'ra Klasîk jî bibîn:

Ew bû **qelem** ew bû ‘eqil lew pê hedîsa da neqil
Deryayê ‘ilm ew bû şuxil **tefsîlê ‘ilmê** cumle da

...

Yek bû **elf-rens nuqte** kir çend şîklê dî lê zêde kir
Her dem peyapey sifre kir bala bi bala rutbe da

...

Xeyb û mîsalê herdu silk peyweste anîn le‘l û mulk
Ew **katibê elmasê kilk** ew **xame** hem ser-rişte da

Nûra tecella hate ‘erş esma hemî lê bûne **neqş**
Enwar çû heta bi ferş isman ji zat ra secde da

Katib qelem dîsa **gerand** ismek ji isman **sewwirand**
Kursî ji nûrê afîrand cennat û xuld û sidre da

...

Wesf û kemalatê subûh **herfên kitaba** ‘eqil û rûh
Ismek divê pê bin wudûh lew lew h û **kilk û xame** da

Ew **nusxeya ‘alî-isim lewhêk** [d]ivêtin reng cisim
Da **herf** pê bin murtesim **herfan** şîkil nûrîyye da

Ew latê husn in ‘eyn in nûrê **sûret bi sûret** tîn zuhûr
Ins û perî wîldan û hûr bejnên di nazik zîne da

Her yek ji feyza ismekî tîn **sûreta tilismekî**
Lew me‘naya her cismekî pertew bi nûrek secde da

...

Hindî ku **xett û nuqte** ne, ewda' û eşkalîna tê hene
Her yek bi miqdarek xwe ne, **xetta** tesewwur rê neda

Miqdar şiklê hendesî, kêr-zêde û hemyan hesî
Yek **nuqteyek** pê naheşî, hetta bi **sethê sufle** da (24)

Sûret bi sûret Heq kişand, lewhê heyûla neqqişand

Zêrav ji nûrê lê **reşand**, teqwîm û şikl û xane da (Melayê Cizîrî, 2012, r. 20-26)

Wekî me li jorê jî behs kir, kitab ji bo teşbîha yarê û rûyê yarê dihête bikarînan ku di layeyekê da mezmûnên li ser hunera kitabê û di layeyên dî da jî hunera afirandina Xweda bi hev re dihêne vegotin. Di encama wê da jî kompozîsyonên çend-alî û çend-wateyî peyda dibin. Helbet şa'ir ji bo ku wan me'nayên pir-alî û pir-laye di nav yek formê da vebêjin mezmûnan bikartînin ku em li ser wan vê babetê îzah biken û mînakên ji *Dîwanê* rêz biken.

3.3. Şahid, Destxet, Xett û Xweşnivîsî

Di konteksta kitab û bedewîya yarê da ibareyeke dî jî “şahid” e. Kelîmeya şahid di *Dîwana Melayê Cizîrî* da nêzîkê bîst caran diborît ku exleb ew digel kompozîsyoneke wesa da ye ku digel wê ibareyên “kitab”, “xettê xubarî”, “nuqte”, “katib”, “nusxe”, “cilwe” û “qudsî” jî derbas dibin. Bi taybet di serê *Dîwanê* da ku şî'rên Melayê Cizîrî yê bi qafîyeya herfa “a/elîf”ê temam dibin da ew kompozîsyon baş hatîye vehonandin. Wêca kelîmeyeke ku ji bo yar, dildar, me'sûq û yeka/e bedew da dihête bikarînan ew e ya ku esasen dîsa ji çanda kitabsazîyê hatîye wergirtin. Lewra şahid di eslê xwe ji bo berhem û kitabên muhteşem, nusxeyên berceste dihête gotin. Anko berhemek estetîk yanî “şahid”, wek mînaka *Erjengê* yan nusxeyeke *Qur'anê* yan jî nusxeya dîwanekê, çawa ji bo estetîkeke giranbiha metafor e û ew nesne bi xwe tinê di destê kesên dewlemend û bijarte da ye, ji bo bedewî û hêjayîya yarê jî hatîye bikarînan. Bo numûne Melayê Cizîrî ji wan yek şî'rên mînak da şahidan tewsîf diket, ew şahid/yar ji alîyê Katib we li wareke pîroz û bala hatîye nivîsîn û neqşîkirin ku xettê nusxeya wê xubarî ye:

Her **şahidek** da dêm ji durr-rûxan di bexş in bi remz û surr
Xettê xubarî nuqtepur katib ji bala **nusxe** da

Herfên kêşandî katibî nûra ji rûh û qalibî
Yek yek bi ismê Wahibî **î'rab** û **qeyd** û **nuqte** da

Nûr in ji ser hetta qedem **neqqaşê sermeşqê** qidem
Pê zeyînan **lewhê** 'edem her yek ji yek dî çeşne da

...

Ew **şahidên** bêrî ji 'eyb her **cilwe** lê dayî di xeyb
Vê 'alemê ew têne ceyb dîsa li hêr ew cilwe da

Reng reng husna **sûretan neqş û nigarê destxetan**
Bala û bejn û qametan goftî di nazik **cilwe** da

...

Husna munezzeh bînîşan we di vê bi neqşê zerefşan

Xal û xettên 'enberkeşan bîn dên di vî lebsê hû da. (Melayê Cizîrî, 2012, r. 14)

Ji ber ku kitab xweşik dihatine çêkirin û ew îşaret û sembola estetîkê bûn bi vî şiklî “şahid” di me'naya “bedew” da ji bo yarê/dilberê jî hatîye bikarînan ku ew yek ne tinê di *Dîwana Melayê Cizîrî* da heye. Ev bikarîname di zimanên dî û edebîyatên dî da jî hatîye ku bi vî şiklî gelek numûne hene. Herwisa gelek numûneyên bikarînan vê kelîmeyê yên ji aliyê Melayê Cizîrî hatî, dişibîne yên Hafîzê Şîrazî ku ew jî ifadeya “şahidê qudsî” bikartînît. Lê ferqa herdu şa'iran ew e ku Hafîzê Şîrazî “şahid”ê tinê bi me'na dilberê bikartînît. Lê Melayê Cizîrî “şahid”ê hem wesa bikartînît hem jî wê kompozîsyona li dor kitabsazîyê, “Katibbûna Xwedê” û çend kome-wateyên dî jî diêxîte bîra mirovî. Yanî di Hafîz da zêdetir ew di wateya tengtir ya rindane da heye lê di şî'ra Melayê Cizîrî da çanda vê edebîyatê bi dariştî dihête dîtin.

Ji aliyê dî ve Melayê Cizîrî gava 'alemê wekî kitabekê teswîr diket, di xuliqandina 'alemê da xetayekê ji bo xaliq/katibê wê nabînît ku di vê numûneyê da têkilîyekê di navbera xaliqîya Xweda û şa'irtîya xwe da saz diket ku çawa Xweda di afirandina 'alemê/dîwanê da karekî bêxeta pêk înayê, Melayê Cizîrî jî di afirandina kitaba/dîwana xwe da xeta nekirîye û ger xetayek hebit ew jî xetaya xameyî/qelemî ye:

Nusxeya 'alem hemî 'inwanek e

Nuqteyek nabit di 'unwanê xelet

...

Hê ji sehwa **xame** bû wer ne ku min

Ev xelet nakir di **dîwanê** xelet. (Melayê Cizîrî, 2012, r. 114)

Wekî ku dihête dîtin Melayê Cizîrî di meseleya medha xwe û şa'irtîya xwe da bingehe li ser afirandina 'alemê ya bêxeta ava diket û bi kelîmeyên têkilî bi hunera kitabê ve hene yên wekî “nusxe”, “nuqte”, “xame” û “dîwan”ê meseleyê bi zelalî vedibêjit.

Di şî'ra Klasîk da peyva “xett”î hem ji bo nivîsê hem jî ji bo mûyên li ser rûyên yarê dihête bikarînan. Loma gelek caran ev herdu wate di şî'rê da têkilhev dibin ku şa'ir bi rêya tewrîyeyê dişê herdu me'nayan bi hev re îşaret biket. Ji ber wê jî xett, bêhn-xweş û nazik in, loma ew exleb digel reyhan/rihan û misk û 'enberê dihête vegotin. Lê ji aliyê dî ve jî wê digel xettê

nivîsê—bi taybet xettê reyhanî, şikeste, nesteliq—yanî kalîgrafîyê jî têkilîyeke taybet heye. Lewra rûyê yarê wek bedrê/heyvê ron e û ew zêdetir wekî pereke kitêbê—perê kitêbeke pîroz/perê *Qur'anê*—dihête teswîrkirin. Herwisa di vê edebîyatê da mûyên li ser rûyên yarê yên zirav û nazik jî yanî ew xett, dişibîne xettên li ser wê kaxeza/perê pîroz yanî nivîsên zirav û piçûk. Jixwe bi taybetî metnên bi xettên şikeste hatîne nivîsîn ku ew xettê nivîsê hem estetîk hatîye dîtin hem jî ji ber hûrikbûna herf û nuqteyên wî xettî, mûyên li dor hinarokên yarê û yên li ser dora dev û lêvên yarê—bi gotina Melayê Cizîrî: “madarê le'1 û durr”—û herwisa ji ber xalên li ser rû wekî teswîra pereke nivîsî hatîye dîtin. Têkilîya herdu xettan digel katibbûna Xwedayê Wehhab û Cebbar û yara rû-kitab di vê şî'ra Melayê Cizîrî ya bi redîfa “xett”ê hatîye vegotin. Ev şî're yek ji mînakên baş e ku nîşan didet ka Melayê Cizîrî xett û çanda kitabê çawa ditîye û bikarînaye:

Dîsan li bedrê katibî kêşa ji nû jengarê xet

Nûrin reşandî Wahib der girdîşê perkarê xet

Herfên ji qudret **nu[q]te** pur madarê hewza le'1 û dur

Evrenge kê wî dî bi ser qudretnumûn zengarê xet

Ew çiçekên şetrî-şibêht ef'a-sifet qelbê me mêht

Selwa ji balayê we rêht ev perdeya gulnarê **xet**

Neqş û nigarê dilberan dercên ji remzên esmeran

Her tîbî bi dest neyşekeran me j'gulşenê purxarê xet

Me j'des[t]xeta terhen şepal **xal û xetên** nûra zela

Danî bi sendoqan li bal marê me sed qentarê xet

Belgên gul û reyhanîyê katib numûçek danîyê

Kes dî bi vê şîranîyê durra sifetê Cebbarê xet

Reyhan û sunbul tê hene sed çiçek û gul tê hene

Avazê bulbul tê hene ev bexçeyê gulzarê xet

Madarê dêm û cebhetê haşa li dora ayetê

Lê rast û çep bû wesletê **cedwelkeşê zunnarê** xet

Îro seher **tuxra nîşan î'rab û herfên durefşan**

Hatin digel **bayê seba** me j'canibê dildarê xet

Ellah di ber qalûbela da yexme ket qelbê Melê

Avête çerxê **cedwelê** evrenge 'enberbarê xet

Îro berata Ehmedî tuxranîşan **zerkeş** me di

Xettê humayûn kes nedî şîrîn me'nadarê xet (Melayê Cizîrî, 2012, r. 110)

Helbet divêtin nehête jibîrkin ku di tesewwûfê da çawa ku rûyê insanan pîroz e û tecellîyya nûra Xwedayî li ser rûyê insanî hatîye neqşîn/nivîsîn û rûyê insanî temsîla şexsîyet û insanîbûnê diket, di vê şî'rê da jî rû wekî taybetîyeke muqeddes dihête dîtin. Loma têkilîya xettên/nuqteyên li ser rûyê insanî û bi xwe rûyê pîroz/ron têkilî heye digel nûra Xwedayî. Ji alîyê dî ve jî têkilîya dî ya ne-mecazî jî meseleya tezhîb û xweşnivîsê ye. Çunku di xettatîyê da gava metnên muhim wek berhemeke girîng dihatine nivîsîn û istinsaxkirin—ji bo ku ew metn ji alîyê estetik ve bêqusûr bît—berîya her tiştî divîya ji destê (destxetê) neqqaşekî/katibekî hosta anko bi xettê wî hatiba nivîsîn/kêşan. Wêca neqqaşî (resm) û xettatî/kalîgrafi (kitêb-destxet) du hunerên cuda ne ku mukemmeliya rûyê yarê digel wan herdu huneran ve dihête izahkirin. Lewra rûyê bedew/bêqusûr yan “wek perê *Qur'anê*” ye ku bi “qelemekî ilahî ve” hatîye çêkirin. Wêca di vê çarçoveyê da çawa ku li ser rûyê yarê mûyê hûrik hene û bêhna zulfê yarê û xalên li ser rûyên wê/wî—ji ber reş-bûna wan—bi misk û 'enberê û bi bêhna gul û reyhanê ve hatine vegotin ku ihtimalen di çêkirina resman û xettatîya da jî têkilîyeke wesa ya rasteqîn jî hebûye. Lewra ji dîdgeha giştî ya beytên li ser rûyê yarê û têkilîya wan ya digel xettatîyê diyar dibît ku bêhna nivîsê/hubrî jî hebûye ku xettatan murekkeba xwe bi bêhnên xweş—ku ihtimalen bi misk û reyhanan—ve dadigirtin û berhemên giranbiha bi vî şiklî dinivîsîn. Loma jî têkilîyeke wesa di navbera xettê rûyê yarê û xettê li ser perên spî yê kitêban hatîye saz kirin.

3.3.1. Xettê Reyhanî û Yaqûtî û Xubarî

Xettê Reyhanî yek ji xettên girîng yê “şeş qelem”ê ye ku ev xette ji “xettê Muheqqeq” peyda bûye. Xettê Muheqqeq jî ji “xettê Kufî” çêbûye ku piştî sedsala 10ê mushefa şerîf anko nusxeyên *Qur'anê* bi “xettê Muheqqeq” hatine nivîsîn. Xette Muheqqeq û Reyhanî du xettên nêzîk yek in ku umrê Muheqqeq zêde nebibît jî bi xettê Reyhanî gelek berhem hatine nivîsîn, bi taybet jî ji bo ku nusxeyên *Qur'anê* xweştir bihêne xwandin ew bi vî xettî hatine zêdekirin. Derheq van herdu xettan da navê du ustadan derbas dibin ku ji wan yek rasterast di nav beytan da jî dihête vegotin. Yek ji wan ustadên mezin yê xweşnivîsîyê Ibnu'l-Bewwab (mr. 1022) e ku wî nêzîkê şêst û çar nusxeyên *Qur'anê* istinsax kirine. Ustadê dî jî Yaqûtê Mustesimî (mr.

1298) ye. Dihête gotin ku van herdu ustadan zêdetir xettên Muheqqeq û Reyhanî bikarînanê û pêşda birine (Serin, 1999, r. 534; Yıldız, 2012, r. 54).

Herweku Chareie & Pourmand jî îşaretê pê diken, xettê Reyhanî xetteke nazik, hûr û zerîf e ku hemû taybetîyên xettê Muheqqeq di wî xettî da hebin jî, ew jî xettê Muheqqeq zerîftir e. Ew bi gul û belg û reyhanê ve dihête teşbîhkirin û ji bo hêsanîya nivîsê jî ev xette hatîye çêkirin. Ji ber ku ev xette bi zerafet û letafet bû bi gul û belg û reyhanê ve dihate gotin, navê wê jî wesa lêhatîye kirin (Chareie & Pourmand, 2016, r. 12). Ji ber wê jî exleb gava behs dihête ser mezmûna xettî û rûyê yarê, şa'ir nuqte û xal û mûyên li ser rûyê yarê dişibînine xettê Reyhanî. Wêca di wan beytan da hem ji ber bêhna wan unsurên ser rûyê yarê hem ji ber rengî hem ji ber referansa wî xettê hûr, navê “Yaqût” jî derbas dibit ku ew jî amaje ye bi ustadê xweşnivîsê Yaqûtê Mustesimî. Lewra di nav kompozîsyona mezmûnên bi hev re têkilî heyî da yên wekî “neqş”, “neqqaş”, “katib”, “misk/reghan”, “reyhanî”, “elmas”, “i'rab”, “herf” û “xett”, em rastî navê “yaqût” jî dihên ku ew jî rasterast referans e bo ustadê xettê Reyhanî anko bo Yaqûtê Mustesimî.

Melayê Cizîrî di *Dîwana* xwe da bi vî şiklî bi kelîmeya yaqûtî ve—ku hem bi me'naya xwe ya eslî ya luxatî ve hem jî bi bîrêxistina Yaqûtê Mustesimî—têkilîya di navbera rûyê yarê, perê kitabê û xettê Reyhanî/Yaqûtî û kompozîsyona giştî ya di vê babetê da di van herdu mînakên da wesa saz diket. Herwisa yaqût di me'naya mucewher da jî kevîreke giranbiha ye ku Melayê Cizîrî digel wan hemû kombînasyonên wateyên cuda, vê wateya mucewherî jî diînîte bîra mirovî û ji bo wê jî exleb “elmas”ê jî digel wan mezmûnan zikir diket:

Yaqûtfiroşan di kef elmas şikestin

Ev **sefheyê elmas** ku **neqqaşî qelem** da (Melayê Cizîrî, 2012, r. 30)

Neqşê elmasî li **elmas** neyê girtîye **herf**

Xettê yaqûtî li **Yaqût** şikênandine nerx (Melayê Cizîrî, 2012, r. 80)

Di nerîta vê şî'rê da mezmûn zêdetir ji bo wesfên yarê dihêne bikarînan ku ew jî piranî li ser wesfên rûyê yarê ne. Wêca çawa ku teşbîha kitabê û perên wê ji bo rûyê yarê dihêne bikarînan, herwisa belg, perên gîya û kulîlkan jî bo heman teşbîhê hatine vegêran. Lewra rûyê yarê ji alîyekê ve rûyê perê kitabeke pîroz bît, ji alîyê dî ve jî gulzar û gulistanek e ku li ser wî rû, bilbil awaz diken:

Belgên gul û **reyhanîyê katib** numûçek danîyê

Kes dî bi vê şîranîyê durra sifetê Cebbarê xet

Reyhan û **sunbul** tê hene sed çiçek û gul tê hene

[Awazê bilbil] tê hene ev bexçeyê **gulzarê xet** (Melayê Cizîrî, 2012, r. 110)

Di nav kompozîsyoneke wesa pirreng û pîrbêhn da rûyê yarê digel unsûrên li ser wî rûyî dihête vegotin ku rengê rû exleb wekî heyvê yan jî wekî perê kitabê dibiriqît. Ji alîyê dî ve jî ew unsûrên li ser rû jî yan bi teşbîha lekeyên li ser rûyê heyîvê yan jî xett û herf û nuqteyên li ser rûyê rûpelê ku temsîla xal û mûyên yarê ne dihêne vegotin. Di van teşbîhan da jî ji ber ku rûyê yarê gelek bi xal in, ew wekî rêşandina miskê dihêne dîtin ku ew jî hem xettên hûr yên perê kitabê hem jî lekeyên li ser rûyê heyîvê diînîte bîra mirovî. Lê ji alîyê dî ve digel wan unsûrên “rengîn” (rengê reş) unsûrên bêhnê jî hene ku eve jî bi misk, ‘enber, reyhan, gul û mawerê ve dihêne gotin. Herwisa sûretên yarê jî wekî gulê sor û gulgûn in, şa‘ir wan reng û bêhnan bi hev re bikartînin. Hetta gelek caran ji bo wê sembola reşatîya kafîran—Xirîstîyanan—û darê kafûrê ku li Hindistan û Çînê berbelav e, peyva “kafur” jî dihête bikartînin. Wekî Melayê Cizîrî, şa‘irên dî jî hin caran ji bo tezata di navbera reş û spî da çêken, digel wan reşatîyan, bo teşbîha didanên yarê, “elmas” yan “nesrîn” yan jî “durr”ê jî bikartînin. Wêca digel wan hemû têkilîyên me‘nayî û teşbîhî ve unsûrên rûyê yarê di layeyê dî yê wan me‘nayan da ji alîyê şa‘iran ve dihête şibandin bo rû-perê kitabê. Helbet ji bo têkelkirina zêdetir ya wan me‘nayan mezmûna munasibtir “xettê reyhanî” ye ku ew hem “xettê kitabê” hem jî bi bêhn û rengê reyhanê ve konteksta gul/reyhanî ya gîyayî diînîte bîra xwûneran. Ji alîyê dî ve digel reyhan û xettê reyhanî exleb ifadeya muselsel dihête bikartînin ku ew jî ji ber “pir-xal”bûna rûyê yarê ye. Bi wê yekê anko bi nuqteyên/xettên zêde belavbûyî, teşbîha di navbera rû û xettê kitabê da qewîtir dibît. Çunku hem xal/xett li ser rû/rûpel belav in, hem jî wextê katib kitabê tamam diket li ser nivîsan bêhnê belav diket ku ew jî exleb yan toza zêr/zubad û zêrav/yaqût yan jî rêşandina miskê ye. Lewra unsûrên reş yên wekî zulf û xalê her tim wekî misk û ‘enberê xweşbêhn in. Ji alîyê dî ev hemû teşbîhe îşareta afirandina rûyê yarê ye ji alîyê neqqaşê ezel û katibê xeybê anko ji alîyê Xweda ve:

Te dîdarê te reftarê te **elmas** in şekerbarê

Bi ‘eynî reh li ser **sadan du nûn reyhan** numan **ebrû** (Melayê Cizîrî, 2012, r. 162)

Kagulê berde bi ser **xal û xetan** ku **muselsel** binumî **reyhanî**

Ismê e‘zem te divê çil ismî ji du herfan bi mu‘emma zanî (Melayê Cizîrî, 2012, r. 174)

Miskê reşandî ez dibêm, wan **nuqteyan** hin bûne kêr

Lê **xettê reyhanî** li **dêm**, **katib** ji nû **î‘rab** da (Melayê Cizîrî, 2012, r. 30)

Bi vî awayî têkilîyên mezmûnî yên me behs kirî di van beytan da bi aşkerayî dihêne dîtin. Herwisa digel “xettê Reyhanî”, Melayê Cizîrî behsa “xettê Dîwanî” jî diket, eve jî xetteke muhim e ku zêdetir belgeyên resmî—yên ji alîyê dîwana dewletê yên wekî ferman, muhimme, berat û ewraqên din—bi vî xettî dihatine nivîsîn. Ji ber ku “xettê Dîwanî” xetteke hûr bûye hatiye şibandin bo xettên rûyê yarê anko mûyên ser sûretê wê. Lê ji alîyê dî ve jî bi têkilîya Siltan û Xweda da û kitaba pîroz û fermanên siltanan ve, pîrozbûna rûyê yarê dihat pesendkirin. Ferman anko neqşa ezêlî ya ku ji alîyê Xweda ve hatiye dan û nivîsîn hem îşareta teqdîra îlahî diket hem jî ew nîşaneyê estetîka îlahî ye ku Melayê Cizîrî wan digel xettên nivîsê yên wekî “Reyhanî”, “Dîwanî” û “Sulis”ê hosa girê didet:

Neqqaşê ezel ismê **cemalê** ku **nivîsî**

Herfên di mucedsem ji surê taze **reşandin**

Reyhanî û **dîwanî** û hem **sulis** û **muselsel**

Yek yek we **hezar reng** li **husnê neqqîşandin**

Ev ayetê nûrê ji Melê ra ku nivîsî

Katib ji surê **nuqte** bi **zêrabê feşandin** (Melayê Cizîrî, 2012, r. 134)

Xetteke dî yê nivîsê jî xettê xubarî ye ku taybetîya wî xettî jî biçûk û hûrbûna wî ye. Ew xettê gelek hûr dihat nivîsîn di eslê xwe da ne xetteke serbixwe ye (Alparslan, 1996, r. 167). Lê ji alîyê dî ve wek telmîh dîsa di konteksta teşbîha di navbera rûyê yarê û rûyê heyîvê û perê kitabê da kompozîsyonek li ser xubarê ava bûye. Lewra rûyê yarê wek bedrê ye û li ser rûyê heyîvê jî xubar û toz hene. Dîsan di hunera kitabsazîyê da jî toz û xubara li ser rûyên kitaban ve dihat weşandin da ku hem murekkeb û xettê kitabê xweştir hişk bibît hem jî nivîs baştir xuya biket. Wêca li ser wan têkilîyan di *Dîwana Melayê Cizîrî* da ev herdu beyt li ser xettê xubarî hosa hatine:

Her **şahidek** da dêm ji durr-rûxan di bexş in bi remz û surr

Xettê xubarî nuqtepur katib ji bala **nusxe** da (Melayê Cizîrî, 2012, r. 14)

Ê ji vî zerfî vexwarî xwend ev **xettê xubarî**

Mestîya çavêt xumarî qenc bizan ew zêde ye (Melayê Cizîrî, 2012, r. 150)

Melayê Cizîrî—herwekî me li jorê jî di babeta *Erjeng* û Manî da behs kirî—di muşa‘ereya xwe û mîrê/hamîyê xwe da wan têkilîyên me‘nayî û mezmûnî bikartînit ku ew gava behsa têkilîyên di navbera xettê nazik yê reyhanî û nesrînbûna—spî û xweşbêhn—rûyê yarê girêdidete neqqaşîya ressamên Çîn û Maçînê yên heta Manî diçin.

Melayê Cizîrî bi vî şiklî hem di nav tradîsyona vegêrana şî'ra Klasîk û temayên tesewwûfî da nerîta vê şî'rê di Kurdî da dupat diket hem jî wan di formeke estetîk da vedibêjît. Digel wê jî bo çanda kitabsazîyê jî mezmûnên li dor kitabê digel awayên xettên ku serdemên klasîk da nivîs û kitab pê dihatine nivîsîn bikartînît. Xettên wekî “reyhanî”, “xubarî” û “xettê şikeste” jî bo sazkirina hunerên edebî bikartînît ku referansên girîng didet ku di Kurdî da ew xettê edebî bi şî'ra wî dihête avakirin.

4. Navên Kitabên di yê di *Dîwana Melayê Cizîrî* da Diborin

Di *Dîwana Melayê Cizîrî* da car bi şeweyekî rasterast car jî bi telmîh û tewrîyeyan navên kitab û muellifan derbas dibin. Ew numûne exleb li dor rûhê beytê û wateya giştî ya helbestê peyda dibin. Weku me li jorê behs jê kirî, *Qur'an* û *Erjeng* di *Dîwanê* da di nav kontekstên cuda da diborin. Jibîlî van kitêban, kitabên ku di nav ehlê medreseyê da û di nav kanona vê edebîyatê da girîng in, ew jî dihêne zikirkirin.

Di Edebîyata Klasîk da yek ji navdartirîn mesnewînivîs Nizamîyê Gencewî ye ku ew bi xemseya xwe yanî pênc mesnewîyên xwe ve bûye pêşengê vê edebîyatê. Yek ji pênc mesnewîyên Nizamî jî *Heft Peyker* e ku ew wek “Heft Sûret” jî dihête zanîn. Melayê Cizîrî jî têkilîya navê berhema Nizamî û naveroka wê di nav konteksta kitabê da bi kompozîsyonekê saz diket. Herwisa hîlbijartina vê mesnewîyê ne tesadufî ye, bereksê wê bi zanatî ew hatiye tercihkirin. Lewra *Heft Peyker* jî alîyê naverokê ve behsa serpêhatîyên Behramê Gur û heft prensesên cuda yê aidê heft welatan diket, ew heft peyker/sûret hem bi bedewîya/bedena xwe hem jî bi vegêrana hikayetan ve wek “bêmîsal” dihêne teswîrkirin. Ji alîyê di ve jî *Heft Peyker* wek kitabekê anko wek nesneyekê jî girîng e, lewra nusxeyên wê jî alîyê katib û xettatan ve hem xweş hatine nivîsîn hem jî ji ber ku di nav wan da sûret/mînyatur peyda dibin, Melayê Cizîrî ew bi hostatî hosa bikarîna: “**Katib di çerxê cedwelî, xweş neqşek** avêtê dilî/ Kir haşîya **Heft Heykelî**, nêv kullîyatê **xemse** da (Melayê Cizîrî, 2012, r. 26).” Herweha mesnewîya di ya Nizamîyê Gencewî, *Xusrew û Şîrîn* jî ji alîyê çand û hunera kitabê ve girîng e. Lewra ji ber ku lehenga temsîla yara bedew, Şîrîn e—û wekî di wê berhemê da jî hatiye vegotin—sûretên Şîrînê jî ji alîyê ressamên Çînî yê navdar ve hatine neqşkirin, ew berhem jî li ser mijara vê gotarê gelek caran dihête neqlkirin. Melayê Cizîrî jî di gelek beytên di konteksta kitabê da—yan jî li ser meseleya “sûret” û “bedewî”yê da—wê berhemê bi bîr diînit: “Mîsalê sûretê Çînê xelet Manî xeta kêşa/ Ku min dîbû li ayînê ji ber zulfa du ta kêşa/ Me dîbû şiklê Şîrînê çu ustadan we nakêşa (Melayê Cizîrî, 2012, r. 206).” Bi vî awayî Melayê Cizîrî jî wekî gelek şa'îrên di têkilîya meseleya neqş, sûret û mezmûnên li dor kitabê digel *Xusrew û Şîrînê* peywendîyekê pêk diînit:

Cebhet û dêmê ji qudret pê **nivîsî herf herf**

Kagulan **ta ta** li ser **herfan kişandî lam lam**

Ew perî weqtê di sundus da ji qundus bin xûya

Bendeyê şahê humayet **Xusruwê Şîrîn** xulam (Melayê Cizîrî, 2012, r. 128)

Şa'iran hej wê îmajê kirine ya ku sûretê insanekê wek rûpelê kitabekê teswîr diket. Ji ber wê jî bi taybet di nav çanda kitabê ya Islamî da hin taybetîyên kitaban hatine bikarînan. Ji wan yek jî kitabên li ser şerha kitabên dî ne. Wekî ku dihête zanîn kitabên li ser şîroveya metnên dî exleb wek kitabên musteqîl in û ew digel metnê eslî dihatine nivîsîn. Anko rûpelê wan kitaban jî du yan sê qisman pêk dihat ku di merkeza rûpelê da metnê eslî yê kitabê cih digirt. Paşê li derkenaran jî şerha li ser wî metnî dihat vegotin ku exleb ew nivîs jî li gor metna eslî, ne li ser xetteke rast dihatine nivîsîn. Yanî bi xetteke hinek berjêrtir yan jî berjortir dihatine nivîsîn. Bi vî şiklî xêz jî di navbera herdu metnan da dihat kêşan ku metnê şerhê jî paşê dihat nivîsîn. Elbet ew metn jî exleb li ser valahîyên derkenaran cih digirt. Loma jî mirov metnê fêhm neket jî gava mirov berhemeke wesa bibînît, dizanît ku du metn li ser yek rûpelî hatine nivîsîn. Ji alîyê dî ve jîbîlî şerhê hin caran muellifan yan jî şarihan hin jêrenot/haşîye li binê rûpelan didan. Wêca di mînakên bi vî awayî da jî rûpel dibine sê qisim ku jîbîlî metnê eslî û yê şerhê, haşîye dihatine zêdekirin. Wêca ger em bihêne ser îmajê rûyê yarê û wan rûpelê şerhan, teswîreke wesa derdikevîte meydanê ku sûretê yarê—sûret herwisa wekî metnê eslî, hatîye neqşkirin, sewirandin jî alîyê katibê ezel ve—metnê eslî yê li ser wê rûpelê ye. Şerhên li derkenaran berjêr hatîne nivîsîn jî zulfên yarê ne. Haşîye jî sîne/singê yarê ye ku nuqte li ser hene ku ji bo ku haşîyeyek bihête dîyarkirin ew bi nuqteyan dihatine îşaretkirin. Di vê çarçoveyê da Melayê Cizîrî ji bo afirandina wê îmajê û têkilîya kitabên şerhê û rûyê yarê kitabeke girîng ya li ser fiqhê *Şerha Lubabê* hilbijartîye ku ew kitab jî di nav ehlê medreseyê da berhemeke navdar e ku gelek meseleyên fiqhî izah û hell diket:

Lebê le'lên te di **bê** herdu bi yek **nuqteyê 'ilm** in⁶

Li **xetê herfê elîf cezme** şîbê helqeyê **bab** e

Xet û **xalên** te bi **mû mû** ji me ra mes'elegoy in

Me ji wan **haşîyeyan sîne** binê **Şerhê Lubab** e (Melayê Cizîrî, 2012, r. 158)

⁶ Muhammed Pêxemberî, Hezretî Elî “wek babê/dergehê ‘ilmê” dîtîye û Hezretî ‘Elî jî di gotîneke xwe ya meşhûr da gotîye ku “ilm nuqteyek bû û cahilan ew mezin kirîye.” Herwisa wî gotîye ku “ilm nuqteya bin herfa bêtê ye û ez jî ew nuqte me.” Wêca Melayê Cizîrî, wan gotînen Muhammed Pêxember û Hezretî ‘Elî bi îbareyên wek “nuqteyê ‘ilm”, herfa “bê” û “bab”ê ve diînîte bîra mirovî.

Helbet Melayê Cizîrî dîsa mûyên li ser sûretê yarê anko xettan wekî xettê li ser rûyê rûpelên kitabê dibînît û wan wekî ibareyên kitabî tesewwur diket yê ku di wan kitaban da meseleyan şerh û şîrove diken. Herwisa sîne hem beşeke bedenî ye hem jî bi me'naya dil e ku Melayê Cizîrî ew bi du wateyan ve bikarîname. Melayê Cizîrî jî bo ku ew me'na di nav yek wêneyî da biguncin kitêba navdar *Şerha Lubabê* bikartînît ku ev kitabe di nav zanîna 'Erebî/dînî da berhemeke girîng e. Wêca çawa wekî di mînakên dî da jî xuya dibît, şa'ir rûyê yarê û nuqte û xettên li ser wî rû, wekî berhemeke girîng dibînît ku bi wê berhemê çareserîya meseleyên dînî peyda bûne. Anko mu'emma û meseleyên bi girê, bi rêya vekirina nuqte û herfan—muşkil-guşa/muşkil-hell—çareser dibin ku Melayê Cizîrî jî wê kontekstê bi awayekî serkeftî bikartînît. Jixwe ew kompozîsyon û têkilîya mezmûnî di gelek mînakên dî da jî diborît, herwekî di serê *Dîwanê* di murebbe'a Melayê Cizîrî ya li ber Hafîzê Şîrazî nivîsîye da jî dîyar dibît: "Ku katib dêmê cedwel ket şikestexet muselsel ket/ Ji yek herfan mufessel ket kî ye vê müşkilê hel ket (Melayê Cizîrî, 2012, r. 228)." Xulase Melayê Cizîrî, têkilîya kitab, katib, cedwel, xettê şikeste, mufesselkirina herfan û helkirina müşkileyan di yek beytê da gotîye.

Kitabeke dî ya ku di *Dîwanê* da derbas dibît berhema bi navê *Hikmeti-l-'Eyn* e ku çawa di herdu beytên li jor da yê li ser *Şerha Lubabê* derbas bûn, di vê beyta jêr da jî heman têkilî xuya ye: "Binê **"nûn"**ên li ser **"sad"**an ku **katib** goşe lê badan/ Seraser **Qaf ta Qaf** e **rumûza Hikmeti-l-'Eynê** (Melayê Cizîrî, 2012, r. 190)." Di vê beytê da Melayê Cizîrî jî alîyekê ve bi herfên "nûn" û "sad"an bi rêya tewrîyeyê behsa çavên yarê diket ku ew herdu herf wek şekl jî bo çavên yarê dihêne bikarînan. Ji alîyê dî ve jî ew herdu herf gava dihêne ba hev, hingî kelîmeya "nass"ê pêk dihêt anko şa'ir qesta *Qur'anê* diket. Wêca çawa ku katib goşeyên wan herfan—anko çavên yarê—dibadet û wan asê diket, ew dibine çîyayê Qafê û ji Qafê asêtir dibin. Lê çawa di beytên jorê da bi rêya xal û xettên rûyê yarê—anko nuqte û herfên li ser rûpelê kitabê—mesele hell dibûn, di vê beytê da jî kitabeke asê heye ew jî berhema Ebu'l-Hesen Necmuddîn Debîran 'Elî bin 'Umer bin 'Elî el-Katibî el-Qezwînî (mr. 1277) ya bi navê *Hikmeti-l-'Eyn* e. Wekî di gelek beytan da diborît mezmûna "katib" jî bo du me'naya dihête bikarînan ku di me'naya ewil da katib kesê ku kitaban dinivîsît û wan tertîb diket. Di me'naya dî da jî katib anko afirînerê ezêlî Xweda ye. Lê di vê beytê da têkilîyeke katib digel navê kitabê heye lewra navê muellifê *Hikmeti-l-'Eynê* bi kurtî el-Katibî ye. Ji ber wê jî Melayê Cizîrî bi her awayî têkilîyên wesa bi hostayî saz kirine ku her mezmûnek ya dî tamam diket û me'na û neqşên beytan berfirehtir dibin. Helbet bibîranîna *Hikmeti-l-'Eynê* ne tinê jî ber navê wê û navê nivîskarê wê ye. "Hikmet'il-'eyn" herwisa bi me'naya serve dihête wateya "hikmeta çavan", anko çavên yarê yê ku sirran aşîkar diken. Yanî di vê beytê da jî Melayê Cizîrî behsa famkirina "'eyn"ê anko

‘alema heyî û berbiçav diket ku ew yek problemeke felsefî ye ku ew kar karê filozofan û ‘aqlmendan e. Lewra ew berhem anko *Hikmetî*’l-‘*Eyn* li ser felsefeya hebûnê/ontolojîyê û metafîzîkê hatîye nivîsîn û têgeheştina wê zehmet e. Lê şa‘îr bi çavên yarê ger wan meseleyan binêrît, ew bi sanahî dişet wan meseleyan çareser biket. Çunku çavên yarê xwedan hikmet in û ew remzan guşa û muşkilan jî hell diken.

Melayê Cizîrî di vê misrayên jorî da jî *Hikmetî*’l-‘*Eynê* careke di zikir diket û li kêleka wê jî behsa kitaba Şebûsterî (mr. 1320) ya meşhûr *Gulşenê Razê* diket. “Bi şêran [ra ku] rimbaz im di **remza qabê qewseynê**/ Bi [‘*eynê*] [**G**]ulşenê [**R**]az im di **babê [H]ikmetil’[E]ynê** (Melayê Cizîrî, 2012, r. 210).” Çawa ku di beytên di da Qaf ta Qaf wek sembola asêbûnê û dûmahîka dinyaya fizîkî hatîye bikarînan di van risteyan da jî semboleke di ya asêbûnê û dûmahîka dinyaya metafîzîk anko cihê ku milyaketê Cebrail jî neşîyaye derbasê wêderê bibît—sidretî’l-munteha—hatîye bikarînan. Lewra ibareya “qabê qewseyn”ê ji aliyekê ve li sidretu’l-muntehayê mesafeya nêzîkbûna Xweda û Muhemmed Pêxember biînîte bîra me ji aliyê di ve jî ew “qews”/birî anko ebrûyên wek hîlal in. Herwisa *Gulşenê Raza Şebûsterî* jî yek ji berhemên kanonîk yên vê edebîyatê ye ku ev mesnewîya tesewwûfî bi taybet ji aliyê vegêranên hekîmane yên li dor wehdetu’l-wucûdê muhim e. Lewra ji bo têgeheştina merheleyên sofîgerîyê, vekirina sirran û famkirina mecaz û me‘nayên kûr yên tesewwûfê *Gulşenê Raz* kitabeke bernîyas e. Jixwe ji navê xuya ye ew gulistana razan e û ew raz jî bi nêrîna/çavê yarê vedîbin. Lê ger em dîsa vegerine ser têkilîya “çav”, “qews”, “katib”, “keman-ebrû”, “kêşan”, “qabê qewseyn”ê û “tecella”yê divêt em li dor “dîtin” û “têgeheştin” û “famkirina sirran” dişên çend şîroveyên di biken. Lê em pêşîyê van beytan bibînin:

Bi şîrînî bi zîbayî çî **katib** bû **dikêşayî**

Te‘alallah nîşan dayî çî wî şîrîn mîsal **ebrû**

...

Nîşana **qabê qewseynî** çî **qews avête ebsaran**

Di teqwîma **tecellayî** di selwê bûn misal **ebrû** (Melayê Cizîrî, 2012, r. 160)

Di des[t] da yengîyek nûbar min di ew **kemanebrû**

Li bala **cedwelek Cebbarî** têda hemqiran **ebrû**

Ku **Heq** ev **herf û xet kêşan** li talayê me derwêşan

Du qewsan goşe lê badan li ser peyweste man **ebrû** (Melayê Cizîrî, 2012, r. 162)

Gava em van beytan şerh biken em dê bibînin ku fi‘la kêşanê di beytên wesa da gelek dihête bikarînan ku ew zêdetir ji ber kêşana cedwelî ye. Lewra katib wextê dixwazît kitabê tezyîn biket

û wê bikete muzehheb, cedwelê dikêşîte ser qalibê kitabê. Lê lêre da me'nayeke di ya hûr û veşartî heye ku heta ew nehête vegotin dê têgeheştina wan beytan kêmbimînît. Ew jî têkilîya kelîmeyên “qews” û “çav” û “kêşanê” ye. Lewra qews ne tinê birîyên yarê yên weku kevanê ne. Anko qews ne tinê hîlal-ebrû ye. Kesên ku bi çavekî bîna *Dîwana Melayê Cizîrî* dixwûnin dizanin ku “qews”—û gelek caran “qews û qezeh”—dihête me'naya keskatî û hêşînayî û terbûnê. Yanî çawa Heq/Katib/Cebbar cedwel û xett û herfan dikêşîte ser perên kitabê, kitab jî kesk—zubad jixwe kesk e—rengareng dibît, katibê ezelî û yar jî gava çavê ‘aşîqî vediket ‘aşîq dibîte bîna. Lê lêre da remza girîng “kêşan” e ku ew fi'1 digel ronbûna çavî wê yekê diînîte bîra mirovî ku mirov dişet “qews avête ebsaran” wek “kêşana kilî li çavan” jî bixwûnit. Lewra kêşana kilî li ser ebrûyan pêk dihêt û ew reşatîya kilî bînayîya çavan xurttir diket. Yanî bi mecazen, ‘aşîq bi xêra kêşana qewsan çêtir dibînit û remzan çêtir hell diket. Lewra tecella xuya dibît. Helbet divêt bibêjin ku Melayê Cizîrî wan hemû têkilîyan bi rêya navên kitab û sembolên li dor mezmûnên kitabê vedibêjît.

Kitabake di ya ku diîsa remzan hell diket û ferqa kufr û dînî bi yeqînî didete fehmkirin berhema girîng ya bi navê *Keşşafê* ye. Digel wê berhemeke di jî *Qanûna* Ibnî Sîna ye ku Melayê Cizîrî diîsa li rexê wan herdu berheman ibareyên Qaf ta Qafê digel remzê bikartînit: “Di **remza** kufr û Islamê **yeqîn fehma** te **[K]eşşaf** e/ Ji ber **[Q]anûn** û îlhamê direxşan **Qaf ta Qaf** e (Melayê Cizîrî, 2012, r. 204).”

Ji alîyê metnên felsefî ve jî Melayê Cizîrî amaje bi zana û filozofan û herwisa berhemên wan kirîye. Bo numûne—wekî di beyta borî da jî dîyar dibît—Melayê Cizîrî amaje bi Ibnî Sîna—Şeyxû's-sanî yan jî [E]bû Elî Sîna—diket ku wî hem digel Îsa Pêxemberî zikir diket hem jî berhemên wî di nav kontekstê da bi me'nayên navên wan berheman lê digel girêya metaforîk vedibêjît. Herweku Nesim Doru jî neql diket bi ya hinek lêkolîneran “Melayê Cizîrî xwe wekî Ibnî Sîna wek “ustadê duyem” dibînit (Doru, 2016, r. 35).” Ji bo ku wê jî dupat biket, Melayê Cizîrî behsa kitabên Ibnî Sîna yên wekî *eş-Şîfa*, *el-Qanûn fî't-Tibb*, *en-Necat* û *Işaratê* diket:

Di ‘işqê **Şeyxê Sanî** me bi dil behra me'anî me

Li zî qelbin we zî hicrin **şifaun fî îşaratî** (Melayê Cizîrî, 2012, r. 194)

Ne bi **Qanûn** ku **Işaret** bi **şifaê** bikirit

Ez hilakê xwe di ‘işqê bi **necatê** nadim (Doru, 2016, r. 35)

Melayê Cizîrî, Ibnî Sînayî ji alîyê şîfabexşîna wî ve wekî Îsa Pêxember dibînit, loma evan herdu navan bi hev re zikir diket. Yan jî beytên ku ev herdu navene têda derbas dibin, bi mezmûnên wekî “remz”, “îşwe”, “mu'cîzat”, “sihr” û “can” ve tijî ne ku eve jî îşaret e bo mu'cîzeyê mirî-

saxkirina Îsa Pêxemberî. Ji vî alî ve ji ber ku Ibnî Sîna jî di tîbbê da navdar e, Melayê Cizîrî wî digel Îsa Pêxember di heman girêka me' nayî da neql diket (Doru, 2016, r. 35). Lewra Ibnî Sîna jî bi hekîmtîya xwe nesaxan sax diket.

ENCAM

Tarîxa insanî ya entelektuelî peywendîyeke xurt li gel nivîs, bandora nivîsê û berhemên nivîskî heye. Insanan tarîxa xwe, fikr û hestên xwe bi rêya nivîsê di berheman da vegotine û ew berhem jî bûne pêngav bo berhemên din. Wekî ku dihête dîtin heta serdemên klasîk, insanan bi rêya berhemên destxetî yên bi estetîk û nadir, hafîze û çanda xwe neqlê cîl û serdemên dî kirine. Berhem yan jî kitab, piştî berbelavbûna çapxaneyê jî îdî ji “nesneyeke aidê civateke teng” ber bi civakeke giştî bûye fenomeneke “public.” Ji ber wê jî ji destê çîneke dînî yan ji destê dêrê derketîye û geheştîye temam civakê. Kitab helbet di civakên cuda da teqabûlê remz û nîrxên cuda diket. Di hin civakên wekî civakên Bisirmanan da bi kitabê sûnd dihête xwarin û kitab nesneyeke pîroz e û xwedan hêz e. Ji danûstandinên ticaretî heta muameleyên wekî nikahê û gelek tiştên civakî da insan destên xwe datînine ser kitaban û bi sûndê li ser wan kitabên pîroz meşrûfîyeta karê xwe pêktînin. Wêca di civakan da kitab gelek caran bi vî awayî ji berhemeke xwandinê zêdetir e û wêvetir e. Loma jî hêza kitabê û hurmeta li hember kitabê ji naveroka wan ve girêdayî bît, gelek caran hebûna kitabê bi xwe têra hêza wê diket. Di vê çarçoveyê da kodên di hafîzeyê insanan da ne tinê li ser agahdayîna kitaban ve tijî ne, digel wê kitab temsîla çand, peywendîya zanîn û hebûn û ya gelek tiştên dî diket.

Di çanda Edebîyata Klasîk da kitab mefhûmeke girîng e ku şa'ir û nûnerên wê edebîyatê exleb xwedan berhem û xwedan telîf in. Zêdetir jî ji ber meseleyên kanona edebîyatê, motîvasyona şa'irên wê serdemê û qaîdeyên wê edebîyatê atmosfereke wesa hatîye sazîkirin ku şa'ir bivênevê referansan didene berhemên berîya xwe. Mecbûren wan teqlîd/adapte diken yan jî asta xwe bi berhemên dî ve dîyar û bilindtir diken. Lewra di vê edebîyatê da hem mîlmîlanêya metnan heye hem jî întertekstualîtî ferzîyeteke qedîm e. Ji ber hindê referansên li ser kitaban zor li dar e û gelek ber bi çav e. Ji alîyê dî ve di vê edebîyatê da ji çand û paşxaneyên cuda hatine istifadekirin ku ev yeke jî bûye sebeb heta ku çandêke kitabî pêk bêtin. Lewra şa'irên Edebîyata Klasîk bi rêya referansên mecbûrî, telmîh yan jî muhtacîyeke şa'irane metnên xwe li ser metnên dî ava kirine. Di encama wê da jî di nav Edebîyata Klasîk da em rastî têkilîyên xurt yên întertekstualîtîyê dihên ku gava em dîwan yan jî berhemeke dî dixwûnin, herwisa rastê gelek navên kitaban dihên yan jî em ji kitabekê çandêke kitabî dibînin.

Ji ber ku şî'ra Klasîk xwedan nerît û kanoneke dîyar e, berhemên ku di vê çarçoveyê da hatine nivîsîn jî girêdayê qaîdeyên wê şî'rê mane. Ew qaîdeyên kanonîk ferzeke giştî ye ku şa'iran

xwe ji wê yekê dîr nexistine û ew têkilî pêkîname. Ji wan şa'iran jî yek Melayê Cizîrî ye ku ew jî pabendê nerîta şî'ra Klasîk e, unsûrên vê şî'rê û rengvedanên wê di *Dîwana* xwe da bi şêweyekî serkeftî vegêrane. Ew yek jî nîşan didet ku ka Melayê Cizîrî bi çi referansan dinyaya xwe ya “kitabî” aşkera diket ku ka wî hay ji çi kitaban hebûye. Jixwe ji mînakên me di vê xebatê da dane jî dîyar dibît ka Melayê Cizîrî çawa hem bi hostatî hem jî bi zanatî ew mijarên li dor kitabê vegotine. Wî ji alîyekê ve li ser mezmûnan têkilîyên me'nayî wesa saz kirine ku ew ji gelek alîyên vê babetê ve şa'îrekî zîrek û berceste ye. Ji alîyê dî ve jî li dor nasîna dinyaya kitabên çanda şî'ra Klasîk da jî bi aşkerayî dîyar dibît ku ew haydarê muktesebat û kitêbxaneyê wê çandê bûye.

Melayê Cizîrî, hem ji ber şa'irtîya xwe û şarazatîya xwe ya di vî warî da hem jî ji ber hakimîyeta xwe ya di warê ‘ilmên dînî da, nûnereke girîng e ku hay ji wê çanda kitabê ye. Loma jî di şî'ra wî da referansên edebî dihêne dîtin ku ew wek şa'îrekî wê edebîyatê numûneyên serkeftî didet. Ji alîyê dî ve jî metnên ku di nav dinyaya şî'ra Klasîk da kêr dihêne dîtin jî di *Dîwana Melayê Cizîrî* da dihêne dîtin. Ew û gelek xalên dîn jî nîşan diden ku şa'îrekî wekî Melayê Cizîrî di berhemdayînê da anko nivîsîna dîwana xwe da berê xwandevanê metna xwe didete ber gelek berhemê dî. Ew berhem hin caran bi zimanê ‘Erebî ne hin caran bi Farsî ne, yan jî hin caran ew kitab berhemê edebî ne yan jî hin caran metnên felsefî, dînî û ‘ilmî ne.

Her wekî ku dihête dîtin, di paşxaneyê Edebîyata Klasîk da kitab dihatine nivîsîn û ji bo wê jî dîsa kitabên dî hem wekî referansên edebî û ‘ilmî dihatine bikarînan hem jî ji bo teşbîhên wekî wesfên rûyê wek nesne jî hatine bikarînan. Bi taybet jî têkilîyên di navbera pîrozbûna kitaban û wesfên yarê di vê şî'rê da balkêş in. Ji alîyekê ve li gor nêrîna nûnerên vê edebîyatê, Xweda kewn û kainat wek kitabeke bê qusûr û bêxeta afirandîye ku di meseleya teqlîd û telîfê da—bi nêrîneke wek mîmesîs û katharsîsê—şa'îr çavêt xwe li hember wê kitabê nagirin. Bereksê wê ji wê dinyayê ilhamê werdigirin û bê jî nû ve saz diken. Lewra di nêrîn û nerîta vê şî'rê da ‘alem jî qelemê Xweda hatiye neqşkirin û ji ber wê jî bê qusûr e; şa'îr jî vê yekê tesdîq diket. Ji alîyê dî ve jî mînaka wê çandê ji alîyê referansên ontolojîk, edebî, felsefî û hunerî, *Qur'an* bi xwe ye. Loma jî Xwedê ne tinê ‘alem bi estetîka kitabeke afirandîye ku şa'îr wê bixwûnît, herwisa Xweda kitab jî hinartine ku ew jî bi xwe ‘alemek in û kan e bo ilhama şa'irane. Loma jî teknîk û şêweyên sazkirina kitaban û tesîra wan li ser avakirina nerîta edebî û estetîka di wan şî'ran da zor girîng in. Çunku şa'iran hem şa'irtîya xwe girê didane kitabên berîya xwe û xwe muhtacê atifa wan didît, hem jî kitab wekî nesneyeke estetîk bikartînan ku hunera vê şî'rê jî dîsa bi muhtacê metafora kitabê bûye. Di encama wê da jî ji *Qur'an* û *Erjenga Manî* heta *Gulistana*

Se 'dî û gelek berhemên edebî û dînî bûne metnên bingehîn heta ku ew çand û edebîyate ava bibît.

ÇAVKANÎ

- Alıcı, M. (2018). *Işığın elçisi Mani ve gnostik düşüncesi*. Divan Kitap.
- Alkış, A. (2014). *Melayê Cizîrî'nin dîvânında tasavvufî mazmunlar*. Nûbihar Yayınları.
- Alparslan, A. (1996). "Gubarî", *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, C. XIV, s. 167.
- Amêdî, Sadiq Bahaddîn. (1977). *Dîwana Melayê Cizîrî*. Çapxaneyê Korê Zanyarî Kurd.
- Asmussen, J. (2011). "Arzang." *Encyclopedia Iranica*. II: 689-90. [neql ji: Alıcı, 2018, r. 199].
- Bozkurt, N. (2002). "Kitab." *Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi*. 26, r. 120-121.
- Câmî. *Dîwanê Eş'âr*: <https://ganjoor.net/jami/divanj/vaseta-eghd/ghazal-jv/sh153>
- Chareie, Abdulreza & Pourmand, Hasan Ali. (2016). "Tecellîye xettê Muheqqeq ber xutûti Reyhan ve Sulus der Kitabeti Qurani Kerîm (Muhaqqaq calligraphy expression in Rayhan and Thuluth in calligraphy the Holy Quran)." *Feslnameyi 'İlmî û Pashoheshiyi Negareh* [Negareh Journal]. Vol: 11, Hj: 39: 4-13.
- Dalkıran, Ö. (2013). "Kitabın tarihi." *Türk kütüphaneciliği*. 27/1: 201-213.
- Doru, M. Nesim. (2016). *Melayê Cizîrî: hakikat ve mecaz arasında bir sûfî'nin portresi*. Nûbihar Yayınları.
- Doskî, Tehsîn İbrahîm. (2018). *Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*. (Bergê Sêyê). Komelgeya Ferhengî ya Ehmedê Xanî.
- Ebdulxenî el-Xenîmî el-Dimeşqî el-Meydanî el-Henefî. (2024). *el-Lubab fî-Şerhi'l-Kitab*. Şifa Yayınevi.
- Febvre, L. & Martin, Henri-Jean. (2000). *Kitabın doğuşu*. (Ji Îtalî bo Tirkî: Gül Batuş). Avcıol Basım-Yayın.
- Kaplan, H. (2021). "Bâkî-iktidar münasebeti ve bu münasebete çok yönlü bir bakış." *Es-seyf ve'l-kalem: Şiir ve Kültürel İktidar*. İKSAD Global Yayıncılık. r.: 47-96.
- Kurnaz, C. (2003). *Divan dünyası*. Bizim Büro.
- Labarre, A. (1994). *Kitabın tarihi*. (wer.: Galip Üstün). İletişim Yayınları.
- Melayê Cizîrî. (2012) *Dîwan*. Turizm ve Kültür Bakanlığı Yayınları.
- Muallim Nâci. (1986). *Osmanlı şairleri*. (amd: Cemâl Kurnaz). Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları.
- Necmüddîn El-Kâtibî El-Kazvînî. (2016). *Hikmetü'l-Ayn* (Varlık Hikmeti). Türkiye Yazma Eserler Kurumu Başkanlığı Yayınları.

- Nizamîyê Gencewî. (1373). *Heft Peyker*. (Bi koşîşê 'Ebdulmuhammed Ayetî). Şirketê Intişaratê 'İlmî we Ferhengî.
- Özcan, N. (2012). "15. Yüzyıl divanlarında dinî benzetmelerle yapılan sevgili tasvirleri." *Gaziantep Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*. 11(1): 159-189.
- Özkafa, F. (2010). Hat sanatı bakımından Mushaf kitabedinin tarihî seyri. *Marife*. 3: 307-326.
- Pedersen, J. (2013). *İslam dünyasında kitabın tarihi*. (Çapa 2.). (wer: Mustafa Mecit Karagözlü). Klasik Yayınları.
- Qur'an*. (2015). [Qur'ana Pîroz û Meala Wê ya Kurdî]. (Amadekar: Hüseyin Gündüz, Mehmet Seyhan). Serokatîya Karûbarên Dîyanetê.
- Schimmel, A. (1984). *Calligraphy and Islamic Culture*. New York University.
- Schimmel, A. (2020). *İki renkli sırma: Farsça şiirin imgeleri*. Alfa.
- Serin, Muhittin. (1999). "İbnü'l-Bevvâb." *DİA*. (Cild: 20). r.: 534-535.
- Tek, Ayhan. (2024). *Melayê Cizîrî: jîyan û tesîra edebî, şerha xezelên bijartî*. Nûbihar Yayınları.
- Tökel, D. A. (2023). *Divan şairi de okur'du*. Ketebe.
- Xaqanî. *Dîwân*. <https://ganjoor.net/khaghani/divankh/ghazalkh/sh367>
- Yazıcı, T. (1997). "Hâfız-ı Şîrâzî." *TDV İslâm Ansiklopedisi*. 15: 103-106.
- Yıldırım, N. (2012). *İran mitolojisi*. Pinhan.
- Yıldız, A. Vahap. (2012). "Osmanlı'da yazı çeşitleri." *Harran Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*. 28, r. 47-62.